

## Felsefeya zimên

Têkiliya ziman bi rastiyê re ji hêla metafizîk û epistemolojiyê (xwezaya zanînê) ve pir girîng e. Ziman hem takekes, hem civak, gel û neteweyan û hem jî jiyan û cîhanê temsîl dike. Li gor vê yekê, mirov tenê bi saya ziman dikare beşdarî jiyana rojane bibe... ***Adar Jiyan/R.5***



## Bûyerên balkêş li Gurcistanê

Lê li hinek cihan jî wêrek e. Xuya ye ku Îvanishvili û hevkarên wî fêm dikin ku Rojava ne tenê xwedî pêşîniyên cûda ye, lê di heman demê de hinek derfetên cûda jî hene. “Xeyal” pê bawer e ku piraniya nifûsê, ne bi qasî alîgirên opozîsyonê... ***Kurdistan Lezgiyeva/R.7***



## Bang, niyet û helwest

Dikare weke nîşana nebûna niyeta cidî ya ji bo reformên demokratîk were şîrovekirin. Ev yek dikare ji ber hesabên siyasî yên navxweyî, an jî stratejiya dewletê ya pêvajo belavkirina demê were nirxnadin. Wisa diyare ku Dewleta Tirk... ***Felemez Ulug/R.6***


30 Hezîran - 6 Tîrmeh 2025
Hejmar: 289
Buha: 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e




## Tiryak amûra şerê bêdeng e

Hevberdevka Platforma Li Dijî Hişbirê Şiyar Be Gulşen Demîrê got der barê bikaranîna tiryakê û çalakiyên ku li dijî tiryakê pêk tînin wiha got: “Ev çalakî û civînên me yên gel wê li gelek deverên bajêr berdewam bikin. Tiryak amûra şerê bêdeng a desthilatê û nîşaneyeke kûr a hilweşîna civakî ye. Tiryak celebek hilweşînê ye ku dewleta nûjen û mekanîzmayên desthilatdariyê ne tenê paşguh dikin, lê di heman demê de carinan bi awayekî sîstematîk teşwîq dikin. Ji ber ku bengîtiya potansiyela berxwedanê felç dike; ew kesê ku difikire, pirsyar dike û rêxistin dike bi kesê pasîf û kontrolkirî diguhezîne. Ji ber vê yekê, tiryakbûn ne tenê pirsgirêkek kesane ye, lê di heman demê de pirsgirêkek avahî û îdeolojîk e jî. Ew krîzeke pergalê û stratejiyeke desthilatdariyê ye. Bengîtî ji bo dewletê bûye stratejiyeke rêvebeStrikethrough riyê.” ***Hevpeyvîna Mehmet Alî Ertaş/R.4***

# Şêx Seîd dengê gel bû

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan peyamek ji konferansa “100 saliya Serhildana Şêx Seîd, Tevgera Azadî, Şêx Seîd û Hevalên Wî, Bîr û Îtiraza Kolektîf” re şand û got: “ Rastiya dîrokî ya ku em di şexsê Şêx Seîd de behsa wê dikin, ji serhildaneke herêmî wêdetir e. Ev rastî têkoşîneke kevneşopî ya ji bo hebûnê ye ku di bîra kolektîf a gelê kurd de şopên kûr hiştiye. Ew têkoşîn serhildana civaka kurd e ku bi bawerî, kevneşopî û îradeyê li dijî zihniyeta yekperest a ferzkirî derketiye holê. Şêx Seîd, wek pêşengekî di şert û mercên serdema xwe de, berpirsiyariya civakî wergirtiye û li dijî polîtîkayên înkarê, helwesteke xurt nîşan daye. Ev serhildana ku di şexsê wî de wateyekê werdigire, ne tenê bertekeke siyasî ye, di heman demê de bertekeke civakî ye jî. Ev bertek îfadeyeke dîrokî ya dilsoziya kurdan a bi heqîqeta xwe re ye. Siyaseta navendîperest û yek-nasnameyî ya ku di salên destpêkê yên Komarê de hat meşandin, armanc dikir ku gelê kurd ji hebûna wan dûr bixe. Şêx Seîd got ‘Me edalet dixwest, lê we cezayê îdamê da’ û bi vê gotinê li dijî vê siyasetê dengê gelekî bir heta sêdarê. Ev gotin nîşaneya herî zelal û bi hêz e ku nîşanî me dide ku heqîqet li hember zilmê paşve gav neavêtiye. Gotinên wî yên wek ‘Bêguman neviyên min wê tola min hilînin’ hêviya berxwedanê ye ku wî ji bo nifşên siberojê hiştiye. Xaleke din jî heye ku divê li vir binê wê bê xêzkirin: Mîna her berxwedaneke dîrokî, serhildana bi serokatiya Şêx Seîd jî, şert û mercên serdema xwe hildigire navxwe. Girêdana wê serhildanê bi têkoşîna azadiyê ya îroyîn re, ne bi romantîzkirina wê, lê bi derxistina dersên binyatî û ji nû ve avakirina berdewamiya dîrokî li ser xeteke azadîxwaz û demokratîk mumkun e....***R.3***



## Serkêşîya Şêx Seîdî

Xoverdayîşê Şêx Saîdî Amed ra heta Dêrsim û Erzîrom vila bîbî. Xeylêk merdimê namdarî beşdarê nê tevgerî bîyî. Înan ra yew Şêx Şerîfo ke cepheyê Xarpêtî rê fermandarîye kerde, bî. Şêx Şerîf eslê xo de dewa Kelaxsî ya qezaya Dara Hênî ya Çewlîgî de ame dinya. Ey Pali, Sêrt û Rojhelat de perwerdeyê medresa girewt û ziwanê sey osmankî, erebî, farsî û kurdî (kurmancî, kirmanckî) zanayêne. Şêx Şerîfî bitaybetî Şerê Dinya yê I. de Cepheyê Çewlîgî de sey fermandarê elaye pijiqnayîşê artêşa rûse de rolêko girîng kay kerd. Gama ke xoverdayîşê Şêx Saîdî dest pêkerd, Şêx Şerîf zî nêzdîyê nê tevgerî bî û 13yê sibata 1925î de Xarpêt de beşdarê xoverdayîşî bî... ***R.9***

## Şiyarbûna derûnî ya Rojava

Ji bo civateke ku bi înkarkirina nasnameya xwe ve bijî, şoreşa herî mezin ew e ku derfetê bide wê ku “di rewşa xwe ya xwezayî de hebe”. Îradeya ku li Rojava hatiye bidestxistin mîna psîkoterapiya kolektîf e. Ew vegera li xweya windabûyî ye, îfadeya hestên ku bi salan hatine tepeserkirin, veguherîna şermê bo serbilindiyê ye. Li vir, serhildana civakî bi şiklê şerekî mezin ê psîkolojîk li dijî şermezarkirin, bêqîmetiya navxweyî û tirsê girtiye. Şoreşa Rojava pratîkeke rizgariyê ye ku tê de avakirina nasnameya siyasî, kolektîf û psîkolojîk bi hev ve girêdayî ne, û mirov hem di asta civakî û hem jî di asta takekesî de xwe ji nû ve diafirînin... ***R.8***

## Şibandina jiyanên wekhev


Têkoşîna Mandela ya herî dijwar ku di sala 1962’an de, bi girtina wî re xwe da der. Di sala 1964’an de, ji “Doza Rivonia” cezayê girtîgehê ya hetahetayî wergirt. Li hember vê li dadgehê bi kûrahî dest bi parastinê kir; bi vê parastinê re hem wekî Serokekî û hem jî wekî filozofekî xwe da der û got: “Ji bo îdeala wekhevî û azadiyê, ger hewce be ez amade me ku bimirim!..” Ev ê gotina wî ne tenê li Afrîkaya Başûr, li seranserê cîhanê deng veda. Di sala 1990’î de, zextên navneteweyî û aloziyên navxweyî yên li Afrîkaya Başûr, rejîma Apartheidê xist rewşeke xerab. Azadkirina Mandela ne tenê serkeftinek bû, di heman demê de ji nû ve zayîna neteweyekê bû... ***R.11***

## 2 meh in ambargo li ser Mexmûrê ye

Mexmûr di bin ambargoyê de ye Hevserokê Meclisa Gel a Mexmûrê Ehmed Şehbaz têkildarî sedema serdana Wezîrê Dadê û binçavkirina şandeyê nirxandin kir û got: “Zêdetirî 2 meh in li ser Wargeha Mexmûrê ambargo heye. Li ser amûrên binesaziya wargehê û pêdiviyên malbatan ambargoyek heye. Me li ser daxwaza meclisa Mexmûrê xwest pirsgirêkên heyî bigînin dewleta Iraqê. Di vegerê de navê me dan seytareyan. Seytareyan jî hatin rêya me girtin. Esasê meseleyê siyasî ye. Dewleta Tirk û PDK dixwazin planên xwe yên li ser wargehê têxin pratîkê. 30 sal in em bi dewleta Iraqê re dijîn. Em li ser vê axê dijîn. Zarokên me li ser vê axê ji dayik bûn. Îro zarokên wan di saziyên wan de kar dikin. Bûne parêzer, bijîşk, qeymeqam û hwd. Zarokên me nikarin bibin parêzer, doktor û wekî din. Ev mafê me ji destê me derxistine. Zarokên me nikarin hem ji bo me û hem ji bo Iraqê xizmetê bikin. Dewleta Tirk naxwaze em wekî wargeh bibin muxatab. Wargeha Mexmûrê di qada navneteweyî de pirsgirêka Tirkiyeyê û pirsgirêka Kurdan e. Wargeha Mexmûrê encama zextên Tirkiyeyê yên 30 salan li ser gelê Kurd pêk hatiye ye... ***R.3***

## Ciniyan reyde komelo demokratîk

Ciniyan heme salone bi cilanê xo yê herêmî û bi rengê kesk û sûr û zerd û mor xemilnaybî. Konferansî destpêkî ra heta peynîye kurdkî dewam kerd û encamname zî kurdkî ame wendene. Ciniyê kurdî semedê awanbîyayîşê yewîya netewî de se bikerî û pawitişê kultur û ziwanî de rolê înan çi yo, têkoşînêkê hemparî senî bidê ser o xeylê qiseykerdiş û munaqeşeyî ameyî kerdene. Nê konferansî de çar atolyeyî ameyî awankerdene û nînan ra yew atolyeya Hozan Mîzgîne yew zî atolyeya Şîrîn Elemhulîye bî, ê bînî zî atolyeyê Ferda Cemîloglû û Jîna Amînî bîyî. Nê her çar atolyeyan de goreba amancê înan ser o xeylê erjnayîşî virazîyayî. Mîsale atolyeya Hozan Mîzgîne de pawitişê kulturî de rol û mîsyonê ciniyan, atolyeya Jîna Amînî de her tewirê şîdet û qirkerdişî ser o rêbazê têkoşînî ameyî munaqeşekerdene. Semedo ke rolê ciniyan bêro fehmkerdene sey Şîrîn Elemhulî û Hozan Mîzgîne ma rê bi hezar serran ruhê mîrasê cuya kurdan nîşan danî. Nê hurdî ciniyan zî cuya xo de pêşengîya şarê xo kerde. Zanayîşê înan ra bigîrî heta hunerê înan, keda înan ra bigîrî heta têkoşînê înan ma rê mojneno ke ciniyî azadîya şarê xo vernîya her çî de vînenî, çunke semedê aye heta cuya xo ra zî fek veradanî... ***R.9***



## Bedena min a kê ye?

Bi hezaran salan e bedena jinan ne tenê wek pêkhateyeke biyolojîk di heman demê de wek qadeke civakî, çandî û polîtîk jî hatiye dîtin. Lê di vê dîtinê de mafê sereke ê ku teşe dide bedena jinan hişmendiya mêrperest e. Bi sedan salan e biryara ku dê jin çi çawa hîs bike, çawa tevbigere û çawa teşe bide bedena xwe ji aliyê mêran ve tê diyar kirin. Ev teşedayîn carna di bin navê olê de carna di bin navê arezûya mêran de yan jî hişmendiya serdast a demê de pêk tê û ji aliyê heman hişmendiyê ve tê meşrûkirin. Hin mînakên vê hişmediyê ku li Çîn, Myanmar, Afrîka û gelemperiya cîhanê dertên pêşberî me vê rastiyê radixin ber çavan. Herçiqas ev pêkanîn li deverên cuda û bi rêbazên cuda li ser jinan pêk hatibin jî xala di van pêkanînan de ya hevpar; binpêkirina mafê biryargirtinê ya jinan e. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rêya çareseriyê bi salan e daye pêşiya jinan û jinan jî bi kedeke mezin di vê rêyê de destkeftiyên mezin bi dest xistine. Êdî jin dizanin ku bi şermên li wan hatine barkirin jiyan nameşe. Ji ber vê yekê ye ku jin bi bedena xwe re derûniya xwe jî nû dikin û jin bi dilrehetî pirsa ‘bedena min a kê ye?’ bi bersiva ‘bendena min tenê ya min e’ dibersivînin... ***R.2***



Medya Bal

# Bedena min a kê ye?

Bi hezaran salan e bedena jinan ne tenê wek pêkhateyeke biyolojîk di heman demê de wek qadeke civakî, çandî û polîtîk jî hatiye dîtin. Lê di vê dîtinê de mafê sereke ê ku teşe dide bedena jinan hişmendiya mêrperest e. Bi sedan salan e biryara ku dê jin çi çawa hîs bike, çawa tevbigere û çawa teşe bide bedena xwe ji aliyê mêran ve tê diyar kirin. Ev teşedayîn carna di bin navê olê de carna di bin navê arezûya mêran de yan jî hişmendiya serdast a demê de pêk tê û ji aliyê heman hişmendiyê ve tê meşrûkirin.

Hin mînakên vê hişmediyê ku li Çîn, Myanmar, Afrîka û gelemperiya cîhanê dertên pêşberî me vê rastiyê radixin ber çavan. Herçiqas ev pêkanîn li deverên cuda û bi rêbazên cuda li ser jinan pêk hatibin jî xala di van pêkanînan de ya hevpar; binpêkirina mafê biryargirtinê ya jinan e.

### Xweşikbûn an îşkenceya sîstematîk

Ji sedsala 10emîn heta destpêka sedsala 20emîn li Çînê ji bo jin bibin xwedî statûyeke baş û zêdetir wek jin bên dîtin ji zarokatiyê ve li gor hişmendiya mêrperest teşe didan bedena xwe. Di sedsala 10emîn de, di hikûmraniya Xanedaniya Tang de bi pêşengitiya Împarator Li Yu yê 2yemîn fikra piyên (ling) jinekê çiqas biçûk be (ku navê piyên lotûs lê tê kirin) ewqas xweşik û erotîk e belav dibe. Ev nêrîna ku di bin serweriya mêrperest de pêş dikeve jinan neçarê vê pêkanînê dike.

Bidestxistina piyên lotûs bi êşeke mezin pêk tê. Ji bo piyên jinekê vê teşeyê bigire hê di temenê biçûk de piyên wê bi qumaşê hevrêşimî tê girêdan. Bi demê re ji bilî tiliya (pêçiya) mezin hemû tiliyên piyê wê û peniya wê ji forma xwe dertên û êdî tu pêkanîna wan namînin. Ji ber ku pî forma xwe wenda dike li gor girêdana bi qumaşê hevrêşimî teşe digire. Di vê pêkanînê de êdî piyên jinan teşeya xwe ya şeklî wenda dike. Jinên ku bi vê şêwazê teşe didin piyên xwe herî kêm 2 salan nikarin bê êş bimeşin û di berdewamiya jiyana xwe de jî vê êşê dikişînin. Lê tevî êşa ku jin hem ji aliyê fizîkî ve hem jî ji aliyê derûnî ve dikşînin nayne dîtin û mehkemeyên girêdayî Xanedaniya Tang vê rêbazê bi qanûnekê dikin jiyana hemû jinan.

### Kontrolkirina bi êş

Yek ji rêbaza ku jinan dike bin desthilatdariya mêran jî sinetkirina jinan e. Di vê pêkanînê de mêr kontrola têkiliya zayendî ji destê jinan digirin û dikin bin tehakûma xwe. Di vê rêbaza ku di bin navê ol an jî kevneşopiyê de pêk tê de mêr qaşo hewl didin 'jina paqij' ava bikin. Di vê pêkanînê de vajînaya jinan tê jêkirin an jî hin caran tê dirûtin û bedena jinan tê seqetkirin.

Sinetkirina jinan li Afrîka, Asya û Rojhilata Navîn zêdetir bê dîtin jî penaberên ku diçin Ewropayê vê rêbazê bi xwe re dibin wir jî. Li gor daneyên Neteweyên Yekbûyî (NY) ji her 20 zarokên keç yek bi xetereya pêkanîna sinetê re rû bi rû ye. Ev jî tê wateya ku nêzê 4,4 milyon zarok niha di bin xetereya seqetbûna genîtal de ne.

Mixabin her çiqas ji bo bi dawîkirina vê rêbazê çalakî werin lidarxistin û 6ê sibatê



Bi sedan salan e ku bedena jinan di bin desthilatdariya hişmendiya mêrperest de ye. Lê êdî jin ji derûniya bindestiyê derketine û xwedî li beden û derûniya xwe derdikevin

wek roja li dijî sinetê hatibe diyarkirin jî, ev xetereya li ser jinan hê jî didome.

### Xweşikbûn e yan zincîr?

Jinên kabîleya Karen a ku li Myanmarê dijî, ji bo xweşikbûnê ji zarokatiya xwe ve xelekekê dikin stûyê xwe. Xelekên ku jin dikin stûyê xwe her sal tên zêdekirin. Bi demê re ji ber ku sermilên jinan tên aliyê xwar de wek ku stuyê wan dirêj bûye xuya dikin. Li gor vê kabîleyê stûyê kîjan jinê dirêjtir be ew xweşiktir e. Lê wek ku me got a dirêj dibe stû nîn e, tenê ji ber ku sermil ji têşeya xwe ya resen dertê stû dirêj xuya dike.

Jinên ku van xelekan dikin stûyê xwe hem di dema razanê de zehmetiyan dikşînin hem jî her ku diçe têkiliya ku bi bedena xwe re datînin kêm dibe. Ev jî rê li ber biyanîbûna ji bedenê vedike.

### Teşedayîna bendena jinan

Ji destpêka dîroka serdestiya mêran heta niha wek ku me di mînakên jor de jî got bedena jinan tim hatiye jêkirin, qulkirin, şikandin, girêdan û dirêjkirin. Lê di tu pêkanînan de jî îradeya jinan an jî hîs û derûniya jinan nehatiye fikirîn. Her çiqas ev rêbazên ku me li jor got hin jê ji holê rabûbin an jî ji bo bidawîkirina wan xebat bên meşandin jî ev zexta ku bi rêya bedena me li ser me tê ferzkirin hê jî didome.

Erê îro piyên me yên lotûs tunene. Sinetkirina jinan li gelek cihan hatiye qedexekirin. Xelekên di stûyê jinan de bûne sembolên turizmê. Lê em her yek ji xwe pirs bikin gelo em ji aliyê bedenî û rûhî ve azad in? Bêguman dê bersiva me her yekê na be.

Îro jî dema em li dinêrin bi fîltreyên medyaya dijîtal, emeliyetên estetîkê, normên şeklê bedenê bedena jinan dikin xizmeta arezûyên mêran. Ev tiştên ku hatin jimartin di hin aliyan de wek pêkanînên dilxwaz bên pênasekirin jî di esasê xwe de her yek jê encama hişmendiya serdest ango hişmendiya mêrperest e.

Judith Butler ji bo pênasekirina vê rewşê wiha dibêje: "Bedena me, berhema çîrokeke civakî ye." Yanê tişta ku jinan pênase dike hebûna jinan nîn e, çavên serdestan ango nêrîna hişmendiya mêrperest e. Ji ber vê yekê ye ku Butler dibêje: " Zayenda civakî tenê biyolojîk nîn e, avakirineke çandî ye. Bedena jinan jî di vê avakirinê de qûrbana herî berbiçav e."

### Sala malbatê

Dema em ji duh tên îro dibînin ku li gelek welatan desthilatdarî hewl didin bi fermanan anku bi qanûna dîsa li gor xwe têşe bidin beden û jiyana jinan. Serokomarê Tirkiyeyê Recep Tayîp Erdogan di vê çerçoveyê de bi salan e bang li jinan dike ku herî kêm 3 zarokan bînin dinê. Dîsa îsal wek sala malbatê diyar kir. Tu ferqa bangên ku ji aliyê serokomarekî ve tên kirin û pêkanînên ku bi sedan salan li jinan hatine ferzkirin, tuneye. Ji ber ku hemû bangên ku tên kirin bi heman armancê tên kirin, yanê ji bo bindestkirina jinan tên kirin. Dîsa hişmendiya ku jinan neçarê çarşefên reş û nav malan dikin jî xwedî heman bingehê ne.

### Rêya çareseriyê

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo vê pergala ku jinan tenê wek amûreke arezû û zêdebûna zuriyetê dibîne, red dike û wiha dibêje: "Vê pergalê zû de ye ku şansê xwe yê guherînê wenda kiriye. Ya pêwist şoreşa jinan a ku li hemû qadan pêk were ye. Çawa ku kolebûna jinan kolebûna herî kûr be, şoreşa jinan jî divê bibe şoreşa herî kûr a azadî û wekheviyê. Pêwistî bi guherînan heye. Şoreşa jinan divê 24 saetan li dijî hişmendiya tecawizkar têbikoşe."

Rêberê Gelê Kurd bi nêrînên xwe li dijî hemû hişmeniyên ku me li jor anî ziman dertê û ji bo çareserkirina pirsgirêkê wiha dibêje: "Hêza jiyanê ya bi jinan re divê ne wekî girêdayî têgihîştina xwedîkirina zarokan û têrkirina arezûya zayendî were dîtin, lê wekî girêdana herî kûr a dostaniyê, hevaltiyê û civakê, parvekirina wekhev û azad di hilberîna bedewî, wefadarî, aştî û esaletê de were dîtin."

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rêya çareseriyê bi salan e daye pêşiya jinan û jinan jî bi kedeke mezin di vê rêyê de destkeftiyên mezin bi dest xistine. Êdî jin dizanin ku bi şermên li wan hatine barkirin jiyan nameşe. Ji ber vê yekê ye ku jin bi bedena xwe re derûniya xwe jî nû dikin û jin bi dilrehetî pirsa 'bedena min a kê ye?' bi bersiva 'bendena min tenê ya min e' dibersivînin.





# Şoreşa Rojava bi xwe re modela xweseriya demokratîk anî

Asya Waşûkanî


Şoreşa Rojava ji tevahî Sûriyeyê re bû modela xweseriya herî rast a demokratîk û weke diyar dibe wê bibe çareseriya herî pozîtîf ji tevahî herêmê re. Wê teyisîna xwe li ser tevahî cîhanê jî bike. Xuya dike ku dê herêmên Sûriyeyê yên din jî vê modelê ji xwe re bikin mînak û di qadên xwe de wê yekalî pêk bînin. Ji xwe modela xweseriya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jiyanî dibe hîna li tu welatên Rojhilata Navîn nehatiye pêkanîn. Di cîhanê de jî gelekî nadîr e. Lê teqez divê were zanîn ku çareya herî rasteqîn jî ew e ku demokrasiya xwecîhî were rêkûpêkkirin. Weke tê dîtin HTŞê ji çareseriyeke wiha re xwe amade nekiriye û tenê li gorî xeyalên xwe yên desthilatdariyê diçe.

Ew desthilatdariya ku kevnar bûye û belaya serê jin û civakê ye, beriya 5 hezar salan û heta roja niha berdewam dike. Di serdema niha de jî mirov dibîne ku di kêliyê de dikarin gund û bajaran xera bikin, bibin sedema kuştina bi hezaran mirovan. Ji xwe gelek nimûneyên vê hene. Xezaya wêrankirî jî weke rojê diyar dibe. Rêber Apo di nava peyamên xwe de qala Xezayê kiriye û gotiye: "Eger em dawiyê li şer û pevçûnan neynin wê gelek Xeza çêbibin. Em rewşa şerê Îsraîl û Îranê dibînin. Li vir mijara me dewlet nîn in, mijara me ya sereke gel in. Ew xelkên sivîl in ku haya wan ji şeran nîne. Qet beşdarî şeran jî nabin. Heke dewlet ji gel bipirsin wê her kes bêje: "Ji şer û tundiyê re na." Nexwê divê were zanîn ên şeran dixwazin komên çete yên di nava dewletê de ne, navê wan serok û wezîr in.

Şerxwaz û tundrew, li pey desthilatdariya xwe digerin û hewl didin serweriya xwe berfireh bikin. Ji bo wê ketine nava pêşbirkê. Her tiştî ji xwe re dikin qurban. Ez li vir lêborînê dixwazim li ser vê gotina xwe ya ez ê bibêjim. Lê hûn teqez bizanin ez ji gotina xwe yeqîn dikim û dibêjim. Ew serokên dewletan ên di şer de israr dikin teqez çete ne û mirovên ji rêderketî ne.

Çavsoriyê li gelan dikin. Dema em dibêjin, "rewşa gelan" teqez divê em tu hêviyan ji wan çeteyên hemdemî nekin. Weke gel pêwîst e em çareseriya xwe bi xwe bibînin. Tevahî gel divê zanibin Rêber Apo ji bo tevahî mirovahiyê li çareseriyê digere. Erka me ye ku em rastiyên heyî bi gelan bidin fêmkirin. Hewce ye were zanîn ku ev 27 sal in Rêber Apo bêrawestan ji bo çareseriya aştiyane têdikoşe.

Rêber Apo 52 sal in têkoşîna azadiyê dide û 27 sal in dibêje xwişkûbiratiya gelan. Gelê kurd li ser esasê xwişkûbiratî, edalet, wekhevî û demokrasiyê perwerde kiriye. Her hewl dide vîna gelan li ser pergala dewletê hakim bike. Divê gel û tevahî welatên heyî ji ezmûna Rêber Apo dersan derxînin û dest bi têkoşînê bikin. Şoreşa Rojava li ser ezmûna Tevgera Azadiyê hatiye destpêkirin û her kes jî dizane ku Rêber Apo 19 salan li Rojava û Sûriyeyê ma, têkoşiya. Ji bo gel, rastiya şeran bibîne û doza azadiya xwe bike, têkoşîn pêş xist. Ez wiha texmîn dikim ku HTŞ û serokê wê Colanî weke her hêzeke ku nû tê ser desthilatê gelekî newêrek e. Nêzikatiyên tund û tûj raber dike û weke ji şemitîna kursiya xwe ditirse.



Pêwîst e pir baş zanibin ku gel kursiyan dişemitîne. Ji ber gel bingehê her tiştî ye û dema xezeba gel bi ser desthilatê de were, tu hêz nikare wê rawestîne. Ji xwe gel nebe wê desthilatdar jî nebin. Ji ber vê hewce ye desthilatdar gelekî haj ji xwe hebin, vîna gel esas bigirin. Nexwê wê têk biçin û wê navê wan jî weke zebalecî derkeve. Ji ber serokên xerab dibin zebale û dikevin nava zebalê. Ji xwe welatên Rojhilata Navîn û cîhanê jî tijî serokên wiha çete û tundrew bûne. Cihê wan jî pir zelal diyar e. Her mirov heta demekê dijî. Weke Rêber Apo gotiye her însan fanî ye. Yanî dawiya her kesî wê were. Lê divê rabihuriya mirov pir pak û paqij be. Hewce ye piştî mirina mirovan jî her kes bi hesreta mirov be, bi başî û qencî behsa mirov bê kirin.

Ji bo min tenê yek Rêber heye û wê her ew bimîne. Ew pêşengê pergala civaka demokratîk e. Eger em li gor Rêber Apo tevbigerin, em ê qet zerarê nebînin. Ji ber ew gihiştiye heqîqetê. 52 sal in ji bo bi me bide fêmkirin têdikoşe. Niha jî divê em weke jin, ciwan û tevahî beşên civakê têkoşîna Rêber Apo jiyanî bikin. Heke tevahî serokên welatan, fikir û ramanên Rêbertî pêk bînin wê sedsalan qezenc bikin. Dem hatiye li Sûriyeyê, Iraq, Îran û di serî li Tirkiyeyê rêbazên Apogerî esas bên girtin.

# Di 1993an de çareserî pêkan bû

Siyasetmedar Fatma Bostan Unsalê li ser pirsgirêkên li Tirkiyeyê got: “Tu pirsgirêkê nebînî dê bêtir mezin bibe. Tu bi tundiyê çareser bikî dê bibe pençeşêr. Li Tirkiyeyê di sala 1993yan de çareseriya pirsgirêkê pêkan bû.”

Veysel Avci

Hewldana civakî ya ji bo aştiyê li Stenbolê bi tevlêbûna saziyên civakî û parêzvanên mafên mirovan di 22- 23ê Hezîranê de “Konferansa Vekirina Rêya Aştiyê” li dar xist. Dadgerê berê yê DMMEyê Riza Turmen, siyasetmedar Fatma Bostan Unsal, Bulent Arinç, Hîkmet Çetîn û gelek rewşenbîr, hunermend beşdar bûn. Têkildarî konferansê Fatma Bostan Unsal anî ziman ku her dem mijara aştiyê kiriye rojeva xwe ya sereke û got: “Di pêvajoya aştiyê ya 2015yan de jî duçerxa aştiye ket xwarê. Lê me tu carî axaftinên li ser aştiyê bi dawî nekir. Piştî gotinên Devlet Bahçelî yên piştî 1ê Cotmehê li ser aştiyê anîn ziman, em bêtir ketin nava xebatên ji bo aştiyê.”



Fatma Bostan Unsalê da zanîn ku der barê pêşveçûna pêvajoyê de tu agahî nayên parvekirin û wiha berdewam kir: “Tenê wekî ‘Tirkiyeya bêteror’ pênase dikin. Em kesên eleqeder, ji bo nexşerê bêtir şênber bibe ketin nava tevgerê. Di sala 2015yan de piştî pêvajoya aştiyê hilweşiya, serdema OHALê dest pê kir. Ji ber OHALê qeyûm tayînî şaredariyan kirin. Daraz xistin xizmeta siyasetê. Ji ber van sedeman, saziyên sivîl li dijî îktîdarê înîsiyatîf girtin destê xwe.”

Fatma Bostan Unsal, li ser encamnameya konferansê jî rawestiya û got: “Di encamnameya Konferansê de em dibînin ku em çiqas ji dewleta hiqûqê dûr in. Me ji neçarî di encamnameyê de ji rêveberên Tirkiyeyê re got biryarên DMMEyê û AYMê têxin meriyetê. Bi salan in biryarên DMMEyê û AYMê naxin meriyetê. Ji bo wê jî karsaz Osman Kavala, siyasetmedar Selahaddin Demirtaş û wekîl Can Atalay girtî ne. Dikarin bêyî ku zagonan biguherînin girtiyên nexweş serbest berdin. Ev mijarên ku divê bi lez bên çareserkirin in. Ji ber Zagona Têkoşîna li dijî Terorê (TMK), bi milyonan mirov bêyî sûcdar bin, bi ‘Terorê’ têne darizandin û cezakirin. Di encamnameyê de me xwest gavên pêwist ên ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê bêne avêtin.”

Fatma Bostan Unsalê, bal kişand ser pêkhateyên konferansê û wiha lê zêde kir: “Di konferansê de nasname, bawerî û nûnertiyên cuda hebûn. Em dibînin ku çawa feraseta yekperest a Tirkiyeyê çanda rengînî û demokratîkbûna Tirkiyeyê xera kiriye. Ji ber vê feraseta yekperest, gelek ziman, çand û bawerî tune bûne. Ev konferans dê bibe sedem ku kesên ker bi guh bibin û daxwazên xwe bînin ziman.”

Fatma Bostan Unsalê, da zanîn ku divê siyaset ji bo aştiyê bêtir qadê veke û wiha pê de çû: “Di her civakê de siyaset di pêvajoyên civakî de diyarker e. Lê li Tirkiyeyê saziyên sivîl û civakî lawaz in. Li Tirkiyeyê qada siyasî bêtir diyarker e. Divê qada siyasî rê li pêşiya aştiyê veke. Dîsa divê medya li hemberî pirsgirêkên civakî hestiyar tev bigere. Ji bo hemû alî bên cem hev, divê medya kesî weder neke û li derve nehêle. Divê wekheviyê esas bigire.”

Fatma Bostan Unsalê destnîşan kir ku Tirkiye pirsgirêkan tune dibîne û ev nirxandin kir: “Dema pirsgirêkek tune bê hesibandin dê mezin bibe. Dema tu bi tundiyê jî meseleyê çareser bikî, dê bibe pençeşêr. Li Tirkiyeyê cara ewil di salên 1993an de hevdîtinên ji bo aştiyê dest pê kirin. Wê demê çareserî pêkan bû. Lê ji ber qelsiya siyaset, medya, karsaz û saziyên civakî bi deh hezaran mirovên me hatin kuştin. Tirkiye derket dervayî hiqûqê. Di aliyê aborî de bi trilyonan zerar çêbû. Niha li Rojhilata Navîn bi awayekî pir zêde hêz cihê xwe diguherîne. Vê guhertina hêza li Rojhilata Navîn, rêveberên Tirkiyeyê îkna kiriye ku pirsgirêkê çareser bike. Ez bawer im ku di pêvajoyeke wisa de mutabakata bi Abdullah Ocalan re dê hem li Tirkiyeyê û hem jî li herêmê aştiyê pêş bixe. Di encama vê peymana guhertina hêzê de DYA û Îsraîlê li dijî Îranê dest bi êrîşan kir. Me dît ku êriş bi serketî pêk hatin. Di encama vê peymanê de dê li qadê hin guhertin jî pêk bên. Lê ji ber qeyûman û daraza ketiye bin bandora siyasetê gav dereng têne avêtin.”


**Divê civak kirdeyê aştiyê be**

Fatma Bostan Unsalê herî dawî anî ziman ku eger heta niha aştî pêk nehatibe, ji ber rêveberiya otoriter e û got: “Ji ber vê yekê divê civak bibe kirdeyê aştiyê. Divê civak di meseleya aştiyê de înîsiyatîfê bigire destê xwe. Ji bo civak bibe kirdeyê aştiyê divê her kes karibe bê cem hev û bi serbest daxwazên xwe bîne ziman.”

# 2 meh in ambargo li ser Mexmûrê ye

Yilmaz Yilmaz

Ji 10ê Nîsanê ve ambargoyeke girankirî li ser Wargeha Mexmûrê tê meşandin. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan û rakirina ambargoyê nûnerên wargehê şandeyek şand Bexdayê. Piştî ku hevdîtin bi Wezîrê Dadê re pêk anî, di 14ê Gulanê roja vegerê de hêzên Iraqê yên nokteya kontrolê şande binçav kir. Şandeya ku ji Hevserokê Meclisa Gel a Wargeha Penaberan ya Şehîd Rûstem Cûdî Ehmed Şehbaz, Hevşaredar Edban Yilmaz û Hevberdevkê Komîteya Têkiliyên Derve Bêwar Emîn pêk dihat, piştî 37 rojan hatin berdan.




Hevserokê Meclisa Gel a Mexmûrê Ehmed Şehbaz têkildarî sedema serdana Wezîrê Dadê û binçavkirina şandeyê nirxandin kir û got: “Zêdetirî 2 meh in li ser Wargeha Mexmûrê ambargo heye. Li ser amûrên binesaziya wargehê û pêdiviyên malbatan ambargoyek heye. Me li ser daxwaza meclisa Mexmûrê xwest pirsgirêkên heyî bigînin dewleta Iraqê. Me xwest pêwistiyên penaberên Mexmûrê bêne çareserkirin. Em bi Wezîrê Dadê Xalit Şivanî re rûniştin. Me di civînê de pirsgirêkên wargehê, meseleyên tenduristî, perwerdehiyê û yên jiyanî parvekir. Wargeha Mexmûrê 30 sal in bi Iraqê re dijî û hevdîtinan dike. Xwedî mafê penaberan ên siyasî ye. Iraq wekî hikûmet û wekî desthilat her tim sozan dide, lê her tim taloq dike. Her tim dibêjin em ê meseleyên av, ceyran û binesaziyê çareser bikin. Dibêjim em ê meseleyên tenduristiyê çareser bikin. Lê her tim taloq dikin. Her ji 3-4 salan carekê van sozan didin û taloq dikin. Heta îro taloq kirine.”

Lê di van hevdîtinên ku em bi wezîrekî û saziyeke dewletê re dikin, em tenê dixwazin ku ev bêdadetiya li ser me hatiye kirin bê rakirin. Em dixwazin mafên welatiyan di aliyê hiqûqê de bê dayîn û parastin. Lê gelê Wargeha Mexmûrê nikare sûdê ji mafê perwerdehiyê, tenduristiyê, aboriyê û xizmeta binesaziyê bigire. Hemû mafên şêniyên wargehê ên bingehîn ji destê wan hatine derxistin. Me ev mesele tev bi Wezîr re parve kirin û em li ser wan axivîn. Di vegerê de me xwest serdana Lijneya Penaberan jî bikin. Lê dema me xwest em Lijneya Penaberan ziyaret bikin gotin ‘Em ne amade ne, em ne li cihê xwe ne. Hûn çima hatine? Ji ber çi hatine?’

Ehmed Şehbaz, da zanîn ku wan li hemberî van pirsên rayedaran gotine wan randevû girtine û hatine û xwestine daxwazên xwe parve bikin û got: “Tişta me ji vê nêzikatiya wan derxist naxwazin pirsgirêkên me çareser bibin. Ji ber me randevû ji Wezîrê Dadê xwestiye û em çûne serdana wezîr vê yekê ew aciz kirine.

Di vegerê de navê me dan seytareyan. Seytareyan jî hatin rêya me girtin. Esasê meseleyê siyasî ye. Dewleta Tirk û PDK dixwazin planên xwe yên li ser wargehê têxin pratîkê. 30 sal in em bi dewleta Iraqê re dijîn. Em li ser vê axê dijîn. Zarokên me li ser vê axê ji dayik bûn. Îro zarokên wan di saziyên wan de kar dikin. Bûne parêzer, bijîşk, qeymeqam û hwd. Zarokên me nikarin bibin parêzer, doktor û wekî din. Ev mafê me ji destê me derxistine. Zarokên me nikarin hem ji bo me û hem ji bo Iraqê xizmetê bikin. Dewleta Tirk naxwaze em wekî wargeh bibin muxatab. Wargeha Mexmûrê di qada navneteweyî de pirsgirêka Tirkiyeyê û pirsgirêka Kurdan e. Wargeha Mexmûrê encama zextên Tirkiyeyê yên 30 salan li ser gelê Kurd pêk hatiye ye. Naxwazin civaka Mexmûrê bibe aliyekî pirsgirêkê.

Ehmed Şehbaz, da zanîn ku piştî ew hatin berdan jî dîsa heman tiştê didome û wiha bi dawî kir: “Em hevî û daxwaz dikin ku mafên ji bo penaberan hatine nasîn têkevin meriyetê. Dixwazin di asta ewlehî û parastinê de mafê gel çareser bike. Lê bi ewlehiyê çênabe. Bi deh hezaran mirov li Mexmûrê dijîn. Ji 7 salî heta 70 salî pêdiviyên mirovan ên jiyanî hene. Pêwistiyên gel ên av, ceyran, nan, çay û ên binesaziyê hene. Pêwistî bi xwarin û vexwarinê heye. Ji kanalîzasyonan heta rê nikare pêdiviyên xwe çareser bike. Rast e rojê çend kîlo ard, şekir û rûn tên. Lê tenê pêdivî ne ev in. Mirovên me yên sewalkariyê dikin hene. Em hevî û daxwaz dikin ku hikûmet dawî li van polîtîkayên li dijî mafên mirovan bîne. Em dixwazin rojek zûtirîn hemû mafên hiqûqî bên parastin û çareserkirin.



# Abdullah Ocalan: Dengê gel darve kirin

Navenda Nûçeyan

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan peyamek ji konferansa “100 saliya Serhildan Şêx Seîd, Tevgera Azadî, Şêx Seîd û Hevalên Wî, Bîr û Îtiraza Kolektîf” re şand û got, “Xeta Şêx Seîd dema ku bi paradîgmaya neteweya demokratîk re bû yek wê bigihêje armanca xwe ya rasteqîn.”

Di salvegera 100emîn a serhildana gel de ku bi pêşengiya Şêx Seîd sala 1925an pêk hat, li paytexta Belçîka Brukselê konferanseke akademîk a navneteweyî hate lidarxistin. Konferans li Centre Culturel Espase Maghê ji aliyê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK), Civaka Îslamî ya Kurdistanê (CÎK) û Enstîtuyên Kurd ên Elmanya û Belçîkayê ve pêk hat. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ser Şêx Seîd peyamek ji konferansê re şand. Peyama Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wiha ye:

“Ji bo Konferansa Sedsaliya Serhildana 1925an;

Cemiyeta Azadî, Şêx Seîd û Hevalên Wî, Bîr û Îtiraza Kolektîf.” Rastiya dîrokî ya ku em di şexsê Şêx Seîd de behsa wê dikin, ji serhildanek an jî serhildêriyeke herêmî wêdetir e. Ev rastî têkoşîneke kevneşopî ya ji bo hebûnê ye ku di bîra kolektîf a gelê Kurd de şopên kûr hiştiye. Ew têkoşîn serhildana civaka Kurd e ku bi bawerî, kevneşopî û îradeyê li dijî zihniyeta yekperest a ferzkirî derketiye holê.

Şêx Seîd, wekî pêşengekî di şert û mercên serdema xwe de, berpirsiyariya civakî wergirtiye ser xwe û li dijî polîtîkayên înkarê yên ku îradeya Kurdayetiyê hedef digirtin, helwesteke xurt nîşan daye. Ev serhildana ku di şexsê wî de wateyekê werdigire, ne tenê bertekeke siyasî ye, di heman demê de bertekeke civakî ye jî. Ev bertek îfadeyeke dîrokî ya dilsoziya Kurdan a bi heqîqeta xwe re ye.

Siyaseta navendîperest û yek-nasnameyî ya ku di salên destpêkê yên Komarê de hat meşandin, armanc dikir ku gelê Kurd ji hebûna wan dûr bixe. Şêx Seîd got ‘Me edalet dixwest, lê we cezayê îdamê da’ û bi vê gotinê li dijî vê siyasetê dengê gelekî bir heta sêdarê. Ev gotin nîşaneya herî zelal û bi hêz e ku nîşanî me dide ku heqîqetê li hember zilmê paşve gav neavêtiye. Her wiha, gotinên wî yên wek ‘Birêz dozger, ka em diçûn bi hev re berx bixwin’ îfadeya komployê ye ku ew pê re rû bi rû maye. Gotinên wî yên wek ‘Bêguman neviyên min wê tola min hilînin’ hêviya berxwedanê ye ku wî ji bo nifşên siberojê hiştiye.

Xaleke din jî heye ku divê li vir binê wê bê xêzkirin: Mîna her berxwedaneke dîrokî, serhildana bi serokatiya Şêx Seîd jî, şert û mercên serdema xwe hildigire nav xwe. Girêdana wê serhildanê bi têkoşîna azadiyê ya îroyîn re, ne bi romantîzekirina wê, lê bi derxistina dersên binyadî û ji nû ve avakirina berdewamiya dîrokî li ser xeteke azadîxwaz û demokratîk mumkun e.

Min ev kevneşopî ji bo veguherîna şoreşgerî ya Kurdbûna azad wek bingeh girtiye dest. Têkoşîna ku ez dimeşînim armanc dike ku mîrata berxwedanê ya watedar a rabirdûyê bi pergala demokratîk, piralî û aştiya civakî ya siberojê re bîne cem hev. Xeta Şêx Seîd dema ku bi paradîgmaya neteweya demokratîk a îroyîn re were hevgirtin, ew ê wateya xwe ya rastîn bi dest bixe.

Kurdbûneke azad bi dilsoziya bi dîrok, çand û nirxên exlaqî-siyasî yên gel re mumkun e. Divê gelê me di vê mijarê de baldar be û mîrateya pîroz a ku rêberên dîrokî li dû xwe hiştiye biparêze.

Li ser vê bingehê, ez Şêx Seîd û hevalên wî bi rêzdarî bi bîr tînim û careke din biryardariya xwe ya ji bo xwedîderketina li nirxên têkoşînê li ser rêya azadî û rastiyê diyar dikim, bi hêviya konferanseke serketî hemî beşdaran silav dikim.

***Abdullah Ocalan/ Îmrali, Hezîran 2025”***

## HIŞBIR POLÎTÎKAYA ŞERÊ TAYBET E

# Amûra şerê bêdeng ê rizandina civakî ye

Mehmet Alî Ertaş

*Di 26ê Nîsanê de Platforma Têkoşîna Li Dijî Hişbirê ya Şiyar Be li ber Bircên Ben û Senê yên li navçeya Sûrê  ya Amedê bi daxuyaniyekê avabûna xwe ragihand. Nûnerên partî, rêxistin, saziyên civakî û şaredarên bajêr beşdarî daxuyaniyê bûn. Platformê di nava 2 mehan de meşên girseyî li dar xistin û li tax û kolanan belavokên ku civakê hişyar bikin belav kirin. Dîsa li gelek parkan kon vedan û xwest balê bikişîne ser talûkeya tiryakê. Têkildarî mijarê em bi Hevberdevka Platforma Li Dijî Tiryakê Şiyar Be Gulşen Demîr re axivîn. Pirsû bersivê me wiha ne:*



Wêne: Rukiye Payiz Adiguzel

Hevberdevka Platforma Li Dijî Hişbirê Şiyar Be Gulşen Demîrê got: “Ev çalakî û civînên me yên gel wê li gelek deverên bajêr berdewam bikin. Tiryak amûra şerê bêdeng a desthilatê û nîşaneyeke kûr a hilweşîna civakî ye.”

***Platforma Li Dijî Tiryakê Hişyar be çima pêdivî bi vê têkoşîn û xebatê dît. Li Kurdistanê û Tirkiyeyê tiryak di çi rewşê de ye?***

Wekî “Şiyar Be! Platforma Tekoşîna Li Dijî Tiryakê”, me piştî pêvajoyekê amadekariyê ya ku bi qasî pênc mehan dom kir, di 26ê Nîsanê de bi daxuyaniyekê damezrandina xwe îlan kir. Di vê pêvajoya amadekariyê de, me bi taybetî hewl da li ser daneyên şaredariyan lêkolîn bikin. Yek ji encamên van lêkolînan ew e ku temenê kesên ku tiryakê bikartînin li Amed û Kurdistanê daketiye 9 saliyê. Vê rastiyê nişanî me da ku pêwîstiya afirandina hişmendiyeke cidî li ser vê mijarê heye. Ev nirxandineke hevpar a hemû saziyên ku pêkhateyên platforma me ne. Mirov nikare vê rastiyê ji polîtîkayên şerê taybet ên li Kurdistanê têne jiyîn serbixwe bigire dest.

***Beriya îlankirina platformê we xebateke çawa meşand?***

Pêwîstiya ragihandina bilez a platforma me û hişyarkirina raya giştî, bi taybetî malbatan, afirandiye. Berî ku em platforma xwe îlan bikin, me girîng dît ku em bi hemû beşên civakê re civînan li dar bixin û li ser vê mijarê raman û pêşniyaran pêşkêş bikin. Bi taybetî me bi rêxistinên civaka sivîl ên ji hemû beşên civakê re civîn li dar xistin, û teqezkir ku bengîtiya bi madeyên hişbir nikare ji polîtîkayên şerê taybet cudatir were nirxandin, û bengîtî ji bo gelek kesan bi nêrînên cûda bûye pirsgirêkeke hevpar û ji ber vê yekê têkoşîneke hevpar pêdivî ye. Bi rastî, me karê xwe lezand, ji ber ku me dizanibû beşdarbûneke xurt di meşa ku me beriya deklarasyonê di 26ê Nîsanê de li dar xist de dê peyamekê bigihîne cihên rast, û piştî meşa me, tevî hemû astengiyan jî me metna deklarasyona xwe bi rayagiştî re parve kir.

***Pirsgirêka hişbirê hûn çawa dinirxînin? Çima bi taybet ciwanan dixin nava vê torê?***

Madeyên hişbir ne tenê pirsgirêkeke tenduristiyê ye. Ew yek ji amûrên şer ên herî sofîstîke yên serdema nûjen e. Belavbûna madeyên hişbir, nemaze li erdnîgariyên ku xwedî kevneşopiyeke têkoşînê ne wekî Kurdistanê, berhema siyaseteke hişmend e ku armanc dike potansiyela şoreşgerî ya ciwanan ji holê rake û hêza xweparastinê ya civakê felc bike. Ev ne tesaduf e; rêbazeke şer e.

Yek ji şêweyên herî qirêj ên şerê taybet ê ku dewlet li Kurdistanê dimeşîne, êrişên li ser ciwanan e ku wan ji nasnameya wan bêpar dike û îradeya wan qels dike. Ev êriş ne bi şîdeta fîzîkî ya rasterast lê bi madeyên hişbir, fihûş, pornografî, bengîtiya dîjîtal û çandeke xerîdar a xirabkirî têne kirin. Ji ber ku dijmin êdî tenê bi çekan şer nake; ew bi rizîbûna civakê ji hundir ve, ji eslê wê veqetandin û ziwakirina damarên berxwedanê şer dike.

***Astengiyên li pêş têkoşîna li dijî hişbirê çine? Rola saziyên sivîl çiye?***

Yek ji astengiyên herî mezin ên li pêşiya avakirina civakeke exlaqî û polîtîk bi bîreke civakî ya xurt polîtîkayên wisa yên gendeliyê ne. Cur bi cur amûrên dewletê, nemaze di demên krîza aborî de, ciwanan ber bi van xefikan ve dibe. Malbatan bêçare dihêle û çalakiyên civaka sivîl krîmînalîze dike. Nîşan dide ku ev şerê taybet bi awayekî sîstematîk tê meşandin. Li pişt madeyên hişbir ên ku bi serbestî di nav taxan de belav dibin, îradeyek heye. Ev ne tenê xerabkariya takekesî ye. Lê celebekî kolektîf ê dagirkeriyê ye. Ji ber vê yekê, rola civaka sivîl divê ne tenê pêkanîna çalakiyên kêmkirina zirarê be, lê di heman demê de eşkerekirina vî şerê qirêj û pêşxistina polîtîkayên ku armanca wan avakirina jiyaneke azadîxwaz û kolektîf li dijî wî ye. Her ciwanek ne tenê takekesek e ku were rizgarkirin; ew hêzeke civakî ye ku were rêxistin kirin. Taxeke bê madeyên hişbir qadeke azadiyê ye. Her perçeyeke civakê ya ji tiryakê rizgarbûyî qadeke têkoşînê ye ku mirov hêza xweparastinê lê ji nû ve bi dest dixe.

***Platformê di nava 2 mehan de xebatên çawa kirin?***

Ji roja ku em wekî platform hatin ragihandin heya niha, me girîngiyeke mezin da xebata li kolanan. Me li sê navçeyên cuda meşên bi girseyi li dar xistin û ji bo parvekirina broşûrên agahdariyê yên ku me amade kirine bi esnaf û welatiyan re çalakiyên cir bi cir li darxistin. Piştî meşa li Parka Rojava, me li Parka Rojava hefteyekê kon danîn û hewl da ku em bi ciwan, jin û malbatan re werin cem hev. Serdanên nûnerên saziyên me bo wan konan û nîqaşên wan ên li ser bikaranina madeyên hişbir, rê da malbat û ciwanên me yên ku ji axaftina li ser vê pirsgirêkê dudil bûn. Bêyî ku mîna yên din hîs bikin, pirsgirêkên xwe derbibirin û ji bo dîtina çareseriyekê alîkarî bixwazin. Me li parkê broşurên agahdariyê bi mêvanên xwe re belav kirin, bi tevlêkirina çalakiyên çandî yên cur bi cur di nobedariya konên xwe de me bi malbat û ciwanan re têkiliyeke nêzîk danî. Wekî din, civaknas û psîkologên me yên ku li Yekîneya bengîtiya madeyan a Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê dixebitin, li ser bengîtiya madeyan pêşkêşî kirin û bi vî awayî, agahdarî ji malbatan re hat dayîn da ku di vê mijarê de baldartir bin. Piştî nobedariya me ya hefteyekê li Parka Rojava, me kon û çalakiyên xwe veguheztin Parka Koşuyolu û li wir sê rojan çalakiyên bi vî rengî li dar xistin. Di encama van çalakiyan de, malbat û ciwanên ku hatin konên me ji hebûna platformek ku li dijî îstismara madeyên hişbir têdikoşe û dikare her cure alîkariyên pêwîst di vî warî de peyda bike, hawîrdorek hat afirandin ku ciwan, jin û zarok dikarin xwe îfade bikin û ji bêhêvîtiyê birevin. Her wiha gengaz bû ku bi nûnerên saziyên ku li ser vê mijarê serdana me kirin re bi awayekî yek bi yek danûstandin were kirin. Van hemûyan me di gihîştina armanca rast a platforma me ya ku ji bo hişyarkirinê hatî damezrandin de xurt kir.

***Ji niha şûn ve hûnê xebatên xwe çawa berdewam bikin?***

Ev çalakî û civînên me yen gel wê li gelek deverên bajêr berdewam bikin. Tiryakbûn amûra şerê bêdeng a desthilatê û nîşaneyeke kûr a hilweşîna civakî ye. Tiryakbûn celebek hilweşînê ye ku dewleta nûjen û mekanîzmayên desthilatdariyê ne tenê paşguh dikin, lê di heman demê de carinan bi awayekî sîstematîk teşwîq dikin. Ji ber ku bengîtiya potansiyela berxwedanê felç dike; ew kesê ku difikire, pirsyar dike û rêxistin dike bi kesê pasîf û kontrolkirî diguhezîne. Ji ber vê yekê, tiryakbûn ne tenê pirsgirêkek kesane ye, lê di heman demê de pirsgirêkek avahî û îdeolojîk e jî. Ew krîzeke pergalê û stratejiyeke desthilatdariyê ye. Bengîtî ji bo dewletê bûye stratejiyeke rêveberiyê.

***Dewlet ji bo civakê kontrol bike serî li kijan rêbazan dide?***

Pêşxistina tiryakê, mantiqa klasîk a xebitandina dewletê li ser kontrolkirina civakê ye. Ev kontrol ne tenê bi zorê tê peyda kirin. Ew bi dorpêçkirinek di asta derûnî, çandî û hestyarî de tê peyda kirin. Bengîtî yek ji rêbazên herî bibandor ên vê dorpêçkirinê ye. Bengîtiya madeyan, bengîtiya dîjîtal û xerîdaran, pornografî, qumar, madeyên hişbir û heta bengîtiya siyasî jî girêdana kesane bi xwe, xwezaya xwe, civaka xwe û rastiya xwe dişkînin. Ev cure şikestin sûdê dide hikûmetê. Ji ber ku kesê bêpirs, tenê û li ser kêfê disekine modela “welatiyê îdeal” e ku ji hikûmetê re hewce dike. Bêbersiv, pasîf û bi hêsanî tê manîpulekirin. Ji ber vê sedemê, pergal girêdayîbûnê ne wekî pirsgirêkek ewlehiyê lê wekî pirsgirêkeke birêvebirinê dibîne. Ev stratejî bêtir kûr dibe, nemaze ji bo neteweyên berxwedêr ên wekî gelê Kurd. Girêdayîbûn li vir dibe amûreke vekirî ya asîmîlasyonê.

***Rol û erka partî û saziyan çiye?***

Berpirsiyariya partiyên siyasî ew e ku nimûneyeke jiyaneke li dervê pergalê pêş bixe ye. Divê partiyên siyasî ne tenê beşek ji mekanîzmayên rêveberiyê bin; divê ew pêşengên jiyana alternatîf bin jî. Ger partiyek îdîa bike ku nûnerê gel e, ew nikare tiryakê wekî pirsgirêkeke tenduristiyê yan ewlehiyê ya asayî bibîne. Bengîtî desteserkirina îradeya civakî ye. Ger gelek ciwanên xwe ji ber madeyên hişber, alkolîzmê, koletiya dîjîtal winda bike, ew gel pêşeroja xwe winda dike. Yekem tiştê ku partî divê bikin ev e ku bi zelalî çavkaniya tiryakê eşkere bikin: modernîteya kapîtalîst, hişê dewleta monîst, têgihîştina jiyanê ya li ser qezencê. Dûv re, ew hewce ne ku li dijî vê têgihîştinê modela jiyaneke azadîxwaz, kolektîf û hilberîner ava bikin. Rizgarkirina ciwanan ji tiryakê ne tenê bi ferzkirina “qedexeyan” li ser wan mimkun e, lê di heman demê de bi vekirina deriyê jiyaneke li ser bingeha têkoşîn, hilberîn, huner û têkiliyên azad jî mimkun e. Avahiyên partiyan divê ne ofîsên ku tenê di dema hilbijartinê de têne vekirin bin, divê bibin navendên hilberîn, hişmendî û hevgirtinê ji bo ciwanan. Eger partî nikaribin vê veguherînê bi dest bixin, ew ê ji pêvekek(eklenti) bêbandor a sîstemê wêdetir tiştek nebin.

***Berpirsiyariya saziyên hiqûqî çi ye? Divê çi bikin?***

Berpirsiyariya saziyên hiqûqî ew e ku dadmendiyê ji nû ve pênase bikin. Sîstema hiqûqî ya heyî wekî amûreke ku berjewendiyên çînên serdest û dewletê diparêze dixebitin. Armanca vê pergalê kontrolkirina avahiyên ku tiryakê xwedî dikin e, ne şerê wan e. Torên tiryakê bi zanîna dewletê pêş dikevin, her çend ew ne di bin kontrola wê de bin jî. Ev tor, ku tax, dibistan û metropolan dorpêç dikin, pir caran têkiliyên rasterast an nerasterast bi dewletê re hene. Rêziknameyeke qanûnî ya rastîn mekanîzmaya xweparastinê ya civakê ye. Erka qanûnê divê ne tenê nirxandina encamên sûcekî be; divê ew jî ji holê rakirina sedemên civakî yên wî sûcî bin. Di vê noxteyê de, divê avahiyên qanûnî yên demokratîk bikevin dewrê. Bi têgihîştineke ku bi meclîsên herêmî re dixebite, ji hêla komîteyên gel ve tê çavdêrîkirin, û li şûna cezakirinê li ser bingeha edaleta sererastker e. Di vê çarçoveyê de, saziyên hiquqi yên ku li dijî tiryakê şer dikin divê van tiştan bikin.

Divê ew avahiyên ku bi pergalê ve girêdayî ne di derbarê sûcên tiryakê de eşkere bikin.

Divê bernameyên qanûnî yên pêşîlêgirtinê li deverên ku ciwan ber bi tiryakê ve têne kişandin (dibistan, taxên bêkaran, deverên koçberiyê) werin pêşxistin û yekîneyên piştgiriya hiquqi yên li ser bingeha civakê werin damezrandin.

Divê veguherîn binheh be, ne cezakirin; divê navendên rehabîlîtasyonê yên lîberal û avahiyên piştgiriya civakî ji bo kesên ku bi tiryakê re têdikoşin werin pêşxistin.

***Berpirsiyariyên rêxistinên civaka sivîl çine?***

Rêxistinên civaka sivîl tenê avahiyên ku xwedî hêz in ku civakê li deverên nedewletî birêxistin bikin in. Lêbelê, avahiyên sivîl ên ku di nav pergalê de entegre bûne, bi fonan ve girêdayî ne, an jî bêpolîtîk bûne êdî nikarin vê rolê bi cih bînin. Rêxistineke civaka sivîl a ku li dijî tiryakê şer dike, nikare bibe avahiyeke ku tenê ji bo “hişyariyê” afîşan çap dike. Divê ew beşek ji hevgirtina civakî, jiyana alternatîf û berxwedanê be.


Eger em lîsteya tiştên ku divê civaka sivîl bike binivîsin, ez ê van tiştan bibêjim:Divê ew li dijî tiryakê banga seferberiya civakî bike û wê mayînde bike.

Divê ew qadên werzîş, huner, çand, ekolojî, muzîk, dîrok û hilberîna kolektîf ji bo ciwanan veke.

Divê ew hişyariya rayagiştî li dijî medyayê, çand û adetên xerckirinê yên ku tiryakê teşwîq dikin bilind bike û nirxên alternatîf ava bike.

Divê ew guh bide pêdiviyên civakê, ne amûrên zordar ên dewletê; divê ew bi înîsiyatîfên herêmî re bixebite, ne yên navendî re.

Di civakeke lîberal de, rêxistina sivîl ne tenê piştgirî ye, amûreke xweparastinê ye. Di şerê li dijî tiryakê de, divê ev rêxistin bibin etîk, wijdan û pêşengiya civakê.



Adar Jiyan

# Felsefeya zimên

Gelo têkiliya di navbera ziman, raman û rastiyê de çawa ye. Ziman û felsefe wekî du qadên bingehîn ên ku xwe berdidin rehên herî kûr ên ramana mirov in ku bi hev ve girêdayî ne û ji hev qet nayên veqetandin



Ji ber ku felsefeya zimên, hebûna mirovan di çarçoveya dîrokî-çandî de vedikole, divê em di vê gotarê de bi ravekirina pirsgirêkên bingehîn ên felsefeya zimên re têkiliya di navbera ziman, raman û rastiyê de binirxînin. Em dixwazin hinekî li ser têgihên xwezaya wateyê, avahiya nîşaneyan, têkiliya derbirina zimannasiyê ya bi rastiya tişteyî re û girêdana hiş û ziman bi awayekî berawirdî ya ku ji hêla perspektîfên felsefeya dahûranî/analîtîk ve tê nîqaşkirin, rawestin.

Bi rastî ziman mala hebûnê ye û mirov tenê bi rêya ziman dikare cihê xwe di cîhanê de bibîne. Ji ber ku wateya peyvekê û bikaranîna wê di ziman de ye, têkiliya navbera ziman û ramanê bi pirsa “Ziman ramanê diyar dike an raman ziman diyar dike?” berbiçav dibe. Hin zimanzan li gor vê fereziyeyê dibêjin; hem ziman ramanê pêk tîne û hem jî raman ziman dişêwîne. Bi vî awayî kesên ku bi zimanên cuda difikirin cîhanên cuda jî ava dikin. Ji aliyekî din ve, zimannas angaşt dikin ku avahiya zimannasiyê ji binesaziya derûnî derdikeve û hebûna rêzimaneke gerdûnî dide niqaşkirin. Di vê çarçovê de, ziman hem berhema ramanê ye û hem jî amûrek e ku ramanê derdibire. Ramana mirov di kêliya ku bi ziman tê derbirin, wateyê dibîne. Û ziman jî bi rêya ramanê digihêje naveroka wateyê. Ziman hem hilgirê ramanê ye û hem jî sînordarê wê ye. Felsefe, bi riya vî zimanî li ser hebûn, zanîn, civak, jiyan, cîhan, exlaq, wate û rastiyê pirsan dipirse. Ji ber vê yekê, teşedan û veguhestina ramana felsefî tenê bi riya derfetên zimên pêkan dibe. Ji aliyekî din ve, felsefe ne tenê ziman bi kar tîne, heman gavê dikeve nav pirsiyarîkirin, dahûrandin û lêgerîna têgihan jî. Pirsiyarîkirina têgihan, bikaranîna peyvan, angaşt, guman û fikarên bingehîn ên derbarê têkiliya ziman û felsefeyê de, her gav bûne sedema dahûrandina zimannasiyê. Ziman ne tenê şêweyekî vegotin û derbirinê ye; ew hem helbest û dilînî ye û hem jî nîşaneke berbiçav a hebûna mirov bi xwe ye.

Ziman tenê ne amûreke ragihandinê ye, herwiha hêmaneke çalak e ku di avakirina raman û zanînê de ye. Felsefeya ziman bi tevahî li ser van pirsan hatiye damezrandin. Peyv an hevok tê çi wateyê? Bi cudakirina wateyê û referansê, divê em tenê bala xwe nedin ser objeya îfadeyê; divê em heman gavê bala xwe bidinê ku çawa behsa wê objeyê tê kirin. Hin zimannas, ziman wekî pergaleke nîşanan pênase dikin; her nîşanek ji “nîşanker” û “nîşankirî”yekê pêk tê. Her çiqas tê gotin ku ziman rastiyê nîşan dide jî, wateya zimên di karanînê de tê famkirin û ber bi wê ramanê ve diçe. Ango tê famkirin ku wate di çarçoveya têkiliyê de teşe digire. Di dîroka felsefeyê de, ziman demekê dirêj tenê wekî amûreke ramanê hatiye dîtin; belê, ji destpêka sedsala 20an û pêve bûye mijareke lêkolînê. Em ê hewl bidin ku bi pirsîna herdu aliyên zanîna hebûnê (ontolojîk) û felsefeya zanistî (epistemolojîk) a zimên xwe bigihînin navenda nîqaşa felsefeya zimên. Ji ber ku felsefeya ziman ne tenê wateya peyvan, heman demê pêvajoya pêkhatina van wateyan, vaca/mantiqa wateyan û girêdana wateyan a bi rastiyê re jî armanc digire da ku mirov li ser baş hûr û kûr bifikire.

Felsefeya ziman, ji bo têgihîştina xwezaya peyvan û heman gavê ramana mirov qadeke lêkolînê ya sereke û bingehîn e. Herwiha bingeha rastiya ramana mirovan e jî. Ev jî tê wê wateyê ku ziman qet nagihêje wateyeke westar û ramaneke mutleq. Girêdana wateyê, avahiya nisbî ya nîşanan û têkiliya tevlihev a ziman bi ramanê re sînorên dahûrana felsefî firehtir dike. Felsefeya dewiyanî (analîtîk) hewl dide ku pirsgirêkên felsefî bi taybetî bi riya dahûrandina zimên bide famkirin. Felsefeya parzemînî ziman di çarçoveya hebûna mirovan û çarçoveya dîrokî-çandî de vedikole. Li gor angaşt û nêzîkatiya hin zimanzanan, ziman qet wateyên westar hilnagire; her nîşanek her gav ji bo nîşaneke din tê veqetandin. Li gor avahiya zimên a nîşanan ziman bi ramanê re têkildar e û sînorên dahûrana felsefî firehtir dike. Lewre ziman tenê ne amûreke vegotina devkî an nivîskî ye; ew hem şert û merc û hem jî nîşaneke hebûna mirov e.

Felsefeya ziman bêtir li ser vê pirsê ye: “Peyv an hevok tê çi wateyê?” Divê mirov tenê li objeya îfadeyekê nenihêre, herwiha divê mirov li girêdana ku ew obje çawa pêk tê jî binihêre. Her çendî ku berê dihat angaştkirin ku ziman rastiyekê nîşan dide jî, di demên dawî de ew ber bi wê ramanê ve çûye ku wate di bikaranînê de pêk tê, ango wate di çarçoveya têkiliyê de ye. Ji ber ku bikaranîna peyvê li gor wateya wê pêk tê, divê wate jî li gor bikaranîna peyvê were ravekirin. Ji bo wê mirov dikare ziman wekî pegala vegotin, derbirin û famkirinê jî pênase bike.

Têkiliya ziman bi rastiyê re ji hêla metafizîk û epistemolojiyê (xwezaya zanînê) ve pir girîng e. Ziman hem takekes, hem civak, gel û neteweyan û hem jî jiyan û cîhanê temsîl dike. Li gor vê yekê, mirov tenê bi saya ziman dikare beşdarî jiyana rojane bibe. Ango, ziman ne tenê cîhanê rave dike; ew heman demê cîhanê jî ava dike. Gelo rastbûna vê temsîlkirinê çawa tê pîvandin û nirxandin? Hiş û vac (mantiq) pîvana vê rastiyê bi verastkirinê sînordar dikin. Belê ev rêbaz ji ber ku ji derbirinên nepêşbînîkirî yên wekî etîk/sinc, exlaq, bawerî, gewzîn û metafîzîkê dûr ketiye, tê rexnekirin. Di têkiliya navbera ziman û ramanê de bi pirsa “Ziman ramanê diyar dike an raman ziman diyar dike?” bêtir berbiçav dibe.


Ji ber ku ziman ramanê ava dike, kesên ku bi zimanên cuda diaxivin jî cîhanên cuda diafirînin an ava dikin. Hin zimanzanên ku hebûna rêzimaneke gerdûnî diparêzin, angaşt dikin ku avahiyên zimannasiyê ji binesaziyeke hevpar der bûye. Li gor vê angaştê, ziman hem berhema ramanê ye û hem jî amûrek e ku ramanê dişêwîne. Gava ku ramana mirov li gor zimên wateyê pêk tîne; wê çaxê ziman jî bi riya ramanê naveroka xwe dibîne. Kesên ku li gor jîrayiya dahûranî ya ku ji felsefeya analîtîk der dibe, tevdigerin, bi taybetî li ser felsefeya zimên hûr dibin û pirsgirêkên xwe bi riya zimên çareser dikin.

Ziman hem hilgirê ramanê û hem jî berdevkê ramanê ye. Mirov bi saya zimên wateyê dide jiyanê û wê radigihîne kesên pêşberî xwe. Felsefeya zimên jî têgiheke wisa ye ku sînor, derfet û nakokiyên vê wateyê dide pirsiyarîkirin. Ji ber vê yekê, têkiliya navbera ziman û felsefeyê ji bo pirsên li ser xwezaya ramanê girîng e. Felsefe, ziman bi kar tîne; belê ziman jî rê nîşanî felsefeyê dide. Ev têkiliya beramber hem ramanê kûr dike û hem jî hewldana mirovan a ji bo famkirinê dewlemendtir dike. Ji ber vê yekê ziman kereseya (materyala) bingehîn a felsefeyê ye. Û felsefeya zimên jî hem ramanê û hem jî ramana ku bi saya zimên tê derbirin, dadihûrîne.



Ahmed Kanî

# Roman û zimanê kurdî li New Yorkê deng veda




Em wek Koma Xwendinê ya Amedê, nêzikî 10 salan e di nava 15 rojan da romaneka kurdî dinirxînin. Me 22yê Gulanê romana Kamuran Çakirî ya bi navê “Gava Pezkovîyek li New Yorkê Bê Kuştin” nirxand.

Dema min dest bi xwendina romanê kir, ez hinek bi navên îngîlîzî (To Kill a Mockingbird-Harper Lee, Fathers and Sons-Turgenyev) yên romanên edebiyata cîhanê aciz bûm. Lê paşê ez lê hay bûm ku ev stîleka romana pirgotinî ye. Her çiqasî nivîskar bi temenê xwe (1982) ciwan be jî têra xwe xwendîye, gerîyaye û niha jî li New Yorkê dijî. Roman bi çîroka nivîsîna romanê ku ji weşanxaneya Helîotropeê ra hatibû şandin, dosyeya nivîskar ji alîyê weşanxaneyê ve hatîye pejirandin û ji edîtora weşanxaneya Jacklinê (ku wek xwedawenda edîtoran dihat hesibandin) ra hatîye şandin, dest pê dike.

Di vê beşa yekem da peywendîyên xwe û Jacklinê yên fermî ku bi rêya nameyan bûn, vedibêje û bi minasebeta civîna pîrozkirina derketina pirtûka yekem a Jacklinê rû bi rû ew hev dibinin. “Çima evqasî behsa mirinê dikî?” dipirse Jacklin. Nivîskar wê dişibîne mehîneke li çiyayên Kurdistanê ku ber bi labîrenta dîrokê ve dibeze. Dîroka welatekî jibîrbûyî, ê ne xwedî dema niha-çend sedsal berê xwedî rabirdûyekî bû. Belkî di demeke nêzîk da bibe xwedî dahatuyekê jî û wiha bersiv dide:

“Di nav vê civatê de her roj peyveke min tê kuştin. Dema dinivîsim, nizanim çima, lê peyvên min xwe bi bêdengiya mirinê ve girê didin. Dema nivîs bi dawî dibe, êdî ne mirin ne jî bêdengîya cihana min nema dikarin bo min bibin sedemên esasî di hişê min de. Wê demê ez ji odeya xwe derdikevim û berê xwe didim kolanên New Yorkê, ew ne tenê bi bêhna mîzê silavê didin te, lê derîyê cîhanên curbicur jî ji te re vedikin.”

Gava axaftina nivîskar diqede, Jacklin bi destê wî digire, wî ber bi şomîneyê ve dikişîne, bi hev ra li ser dîwana sor rûdinên û wiha dipirse:

“Te di teksta xwe ya bi navê Rêwîtîya min ji Gelîyê Zapê ber bi Gelîyê Celladê ve digot ‘Jîyan pêvajoya afirandina çîrokan e. Çîroka me jî û êş û kederên me jî yek in.’ Te di navbera her du gelên welatên cuda de kîjan têkilîyên hevpar dîtin?”

“Hemî tiştên hatine serê wan hema bêje wek hev in-prosesa asîmîlasyonê û tunekirinê-. Armanc tunekirina zimanî ye. Dema zimanek nema bikare çîrokên xwe ava bike, em êdî nikarin behsa zindîbûna wî bikin. Ya em pê re eleqedar dibin kuştin, qirkirin û îşkence ye. Lê ya em guh nadinê yan jî kêm guh didinê, ziman bi xwe ye.”

“Gotinên te hev nagirin. Ka te ji xwe re digot ez mirovekî bêziman im? Gelek caran te pesnê bêzimaniyê jî dida. Lê niha tu dixwazî qesra zimên ava bikî.”

“Ez di nav kaosa zimên de hatime dinê. Niha jî ez nizanim ka kîjan ziman ê min e. Di hişê min de valahîyek heye. Pirî caran ji bo ku ez ji zimanê dagirkerên xwe birevîyama, zimanên nû hîn dibûm û min bi wan zimanan dinivîsî. Dîsa jî min xwe ji dengên dê û bavê xwe cihê nedikir. Pêvajoya bêzimanîyê ji bo min gerînekek e di navbera zimanên bîyanî de. Her zimanekî nû, ez ji zimanê dagirkeran dûr dixistim û nêzîkî zimanê diya min dikirim. Mîna ku min galaksîya bi navê Kurdistanê û zimanê wê ji nû ve keşf dikir.” (... r. 9-10)

Mebesta me ji vê jêgirtina derêj ew e ku hinek rûxsar û atmosfera romanê ya destpêkê ji hêla zimanî ve li ber çavan rabixin. Ev jî nîşan dide ku roman bi awayekî indîrekt (nerasterast) girîngîya zimanê kurdî derdixe pêş. Zimanê mexdûran bi kar neanîye, bi serbilindî parastina zimanê kurdî dike.

Dema em behsa karakterên romanê bikin, dikarin bibêjin ku bi vegêrana (vebêjerîya) kesê yekem, ji serî heta dawî çîrok tê pêşkeş kirin. Vegêr wiha dibêje:

“Navê min Mîr e. Du navên min hene. Ê din jî Thomas e. Lê dîsa jî nikarim bibêjim ez Mîr Thomas im. Mîr Thomas kurê min e. Dema kurê min li kuçeya 56an a New Yorkê ji malzaroka diya xwe Jacklinê ket, me biryar da ku navê wî Mîr Thomas be. Navê min jî êdî tenê Thomas e. Dema Mîr Thomas mezin bû, Thomas wek nav ji xwe re hilda. Êdî ew Thomas ez jî Mîr bûm.”

Em bi vê paragrafê hîn dibin ku karakterên sereke, Mîr, Jacklin û zarokê wan Thomas in. Bi rastî ev çîrok gelek karakteran di xwe da dihewîne. Çîrok ji hêla mekan ve zêde zêde berfireh e. Li New Yorkê dest pê dike. Bi rêya flashbackan zaroktîya karakter li çar alîyên Kurdistanê dibihure. Zaroktîya karakter şeş meh li cem dapîra wî derbas dibe. Gelek bûyerên serenckêş di vê demê da têne vegêran. Mînak ji bo wesîyeta Nûh bigirin ew û dapîra xwe diçin çiyayê Gilîdaxê. Di rê da rastê Simko û şervanên wî tên. Nûh pirtûka sêhrbazan radestî wan dike.

Li hember Thomas Harry Powell ji bo bi destxistina vê pirtûkê her di şer da ye. Ji bo bidestxistina pirtûka Sêhrbazan Thomas dikuje. Dosyeya romanê tê dizîn. Lê Mîr Thomas her dixwaze romana xwe bide çapkirin.

Di romanê da gelek macera hene ku wek aksiyona fîlmê sînemayê dewam dikin. Li alîyekî din karakter her gav bi jinên cuda cuda ra di nav têkilîyan da ye. Ev jî yek ji hêla wê ya sînemagrafîk e. Ger hûn jî dixwazin macera û bûyerên ecêb bixwînin kerem kin hûn jî romana Kamuran Çakir, a bi navê “Gava Pezkovîyek li New Yorkê Bê Kuştin”ê bixwînin.

# Bang, niyet û helwest

Ji salên 90î û vir ve li ser bangên Rêber Apo gelek caran pêvajoyên aştiyê hatin despêkirin. Lê ev pêvajo hemû ji aliyê partiyên deshilatdar anku hêzên di nava dewleta kûr de li gorî berjewndiyên xwe hatin destgirtin û têk birin

Xweşkanî
Felemez Ulug




Pirs û nêrînên li ser rewşa ku bi banga Rêber Apo despêkiriye di rojeva gelê Kurd û herêmê de ye. Piştî banga Aştî û Civaka Demokratîk; PKKê bi awayekî wêrekî Kongreya xwe ya 12emîn kom kir û biryarên gelek girîng girtin. Ev biryar ne tenê ji bo Kurdistanê ji bo demokrasiya Tirkiye û Rohilata Navîn jî deriyên nû vedike. Li hemberî vê pêvajoya ku bi hewldanên Rêber Apo hatiye destpêkirin dewleta Tirk xwe giran dike û hewil dide ku ji rewşa heyî li gorî berjewnediyên xwe sûd werbigire. Em ê hewil dibin ku bi zimanekî zelal û bi awayekî analîtîk bersivê bidin çend pirsên derbarê rewşa heyî de.

Di 27ê Sibata 2025an de, Rêber Apo ji girtîgeha Îmraliyê bangeke dîrokî kir û xwest ku PKK kongreyekê li dar bixe, dawî li têkoşîna çekdarî bine û xwe fesix bike. Da ku pirsgirêka Kurd bi rêyên demokratîk û siyasî bê çareserkirin. Ev banga, dawî li têkoşîna çekdarî ya zêdetirî 40 salî tîne bi armanca rê li ber diyalogeke siyasî veke hate kirin. Ne tenê li Kurdistanê û Tirkiyeyê, li seranserî cîhanê ev bang erênî hate pêşwazîkirin û ji bo wê piştgiriyek xurt hebû.

Di navbera 5-7ê Gulanê de, PKKê li herêmên Parastinê yên Medyayê Kongreya xwe ya 12mîn li darxist û biryarên girîng girt. Di nav van biryaran de, rawestandina şerê çekdarî, fesixkirina sazûmaniya rêxistinî ya PKKê, û veguherîna têkoşînê bo qada siyasî û demokratîk hebûn. Ev biryar weke bersiveke erênî ya ji bo banga Rêber Apo hatin nirxandin û ji hêla gelek aliyan ve erênî hate pêşwazîkirin.

Her çendî Serokomarê Tirkiyeyê Recep Tayyip Erdogan û wezîrên wî, biryarên PKKê weke "dîrokî" bi nav kirin û gotin ku ev yek wê "ji bo aştiyê gaveke girîng be" jî, lê heya niha dewleta Tirk gaveke berbiçav an hewldaneke ji bo piştgiriya vê pêvajoyê neavêtiye. Mînak, reformên qanûnî yên ji bo garantîkirina mafên Kurdan, baştirkirina şertên Rêber Apo yên li girtîgehe Îmraliyê, an jî serbestberdana girtiyên siyasî û nexweş nehatine rojevê.

Tê dîtin ku dewlet û partiya desthilatdar AKP di vê pêvajoyê de ne li gorî pêwîstiyên heyî tevdigere. Li şûna guh bide daxwazên civakê û aliyên pişgiriyê didin vê pêvajoyê, li gorî berjewendiyên xwe tevdigere. Bêgûman mirov dikare vê yekê bi çend sedeman ve girê bide.

Ji salên 90î û vir ve li ser bangên Rêber Apo gelek caran pêvajoyên aştiyê hatin despêkirin. Lê ev pêvajo hemû ji aliyê partiyên deshilatdar anku hêzên di nava dewleta kûr de li gorî berjewndiyên xwe hatin destgirtin û têk birin. Niha jî gûman heye ku AKP vê pêvajoyê bike qurbana hesabên xwe yên siyasî. Lê divê em ji bîr nekin ku ev pêvajo naşibe yên berê. Her çendî dewleta Tirk bi zihniyeta xwe ya derdestî û dagirkeriyê nêzî pêvajoyê dibe jî di halê heyî de li gorî tê xuyakirin însiyatîf di destê Rêber Apo de ye. Ev jî baweriyeke xurt dide Tevgera Azadiyê û derdorên demokratîk ên pişgiriyê didin vê pêvajoyê.

Bêgûman di vê pêvajoyê de erk û berpirsiyariya DEM Partiyê jî xwedî girîngiyeke mezin e. Şandeya Îmraliyê ya DEM Partiyê bi hevdîtinên xwe yên li Îmraliyê û bi partiyên siyasî, saziyên civakî û hêzên demokrasiyê re hêz dide vê pêvajoyê. Lê divê bê zanîn ku erk û berpisiyariya DEM Partiyê ew e ku vê pêvajoyê ji civakê re ragihîne. Niha di bin navê Hevdîtinên Civaka Demokratîk de li gelek navendan civînên gel têne lidarxistin. Ev civîn ji bo ku civak jî beşdarî pêvajoyê bibe girîng in. Lê divê ev civîn bi bajarê Kurdan re tenê sînordar nemînin. Li gorî baweriya min ji Kurdan zêdetir pêwîstiya civaka Tirkiyeyê heye ku vê pêvajoyê fam bike û derxe zanebûnê. Lewma divê tora van civînan hîn befirehtir bibe da ku bikaribin xwe bigihînin hemû beşên civakê. Ger di vê çarçoveyê de xebateke civakî were meşandin û gel beşdarî pêvajoyê bê kirin; ez di wê baweriyê de me ku dê deshilat jî nikaribe li dijî vê rewşê bêhelwest bimîne. Dê neçar bimîne ku gavên pêwîst bavêje.

Di vê pêvajoyê de yek ji pirsgirêkên sereke jî mirov dikare bêje nebûna baweriyê ye. Tevgera Azadiyê dibêje ku serkeftina pêvajoyê bi zemînekî qanûnî û mafên demokratîk ve girêdayî ye. Lê dewleta Tirk heta niha di vê mijarê de gavê pêbawer navêtiye. Heta niha îşaretên gavavêtinê jî nîşan nedaye. Ev yek jî bi serê xwe baweriya li dijî dewleta Tirk kêm dike. Her çendî di van çend rojên dawî de di bunya meclîsê de nîqaşên ji bo avakirina komîsyonê hatibin despêkirin jî mirov dikare bêje ev têrker e.

Ji bo ku pêvajo bi ser bikeve, dewleta Tirk divê gavên baweriyê biavêje. Wekî baştirkirina şertên Rêber Apo, serbestberdana hin girtiyên siyasî, an jî reformên qanûnî yên ji bo mafên çandî û siyasî. Hemû civak îqna ye ku Tevgera Azadiyê di vê pêvajoyê de tişta ketiye ser milê wê bi berpirsyariyeke mezin pêk aniye. Bawer dike ku gavên pêwîst avêtiye. Lê heya niha dewleta Tirk gaveke berbiçav neavêtiye. Ev jî şik û gûmanan zêtir dike.

Em dikarin bêjin ku helwesta dewleta Tirk a ku heya niha gaveke berbiçav neavêtiye, dikare weke nîşana nebûna niyeta cidî ya ji bo reformên demokratîk were şîrovekirin. Ev yek dikare ji ber hesabên siyasî yên navxweyî, an jî stratejiya dewletê ya pêvajo belavkirina demê were nirxnadin. Wisa diyare ku dewleta Tirk li gorî geşedanên li herêmê diqewime nêzî pêvajoyê dibe.

Divê were zanîn ku ger dewleta Tirk ne stratejîk, taktîk nêzî vê pêvajoyê dibe, dê pir mezin winda bike. Dê Tirkiye bi xwe winda bike. Ji bo ku ev firseta dîrokî bi ser bikeve, divê dewlet bi awayekî zelal û berbiçav gavê şênber bavêje. Gavên ku bên avêtin jî di warê yasayî û siyasî de pêvajoyê hilde bin garantiyê. Ger di vê çarçoveyê de nêzî banga Aştî û Civaka Demokratîk ya Rêber Apo bibe wê bikaribe di siyaseta herêmê de jî bibe xwedî misyoneke girîng. Nexwe ger wisa tev negere û pêvajoyê bike qurbana hesabên xwe yên teng, dê mezin winda bike.

# Manîpûlekirin, aştî, demokrasî û azadî

Hisên Çatikkaş

Di kesayeta rojhilata navîn de dinya di nav pêvajoyeke gelek hesas de ye. Ev rewşa hesas di nava xwe de şerê dinyayê yê sêyemîn dihewîne ku dizaynkirin û terbiyekirina mirovatiyê armanc dike. Lewra li hêlekê hêzên navnetewî yên wekî Emerîka, Îngilistan û Îsraîlê li hêla din jî hêzên herêmê yên wekî Îran, Rûsya û Tirkiyeyê li ser xwîna gelên herêmê gefan li hev dixwin û her wiha çekên xwe li hemberî gelan bi kar tînin.


Di nava vê tevlîheviyê de Tevgera Azadiya Kurdistanê jî hemleyeke nû da destpêkirin. Bêguman di nav ewqas krîz û tevliheviyan de hemleyên nû xwedî rîskên mezin in. Ango di vê hemleya tevgera azadiya Kurdistanê de jî ji hêla serkeftin û têkçûnê de xeteke pir zirav heye. Bêguman rewşa kurdan a siyasî û dîplomatîk wê vê xeta zirav ber bi serkeftinê ve stûr bike. Ango rewşa siyasî ya Kurdan çiqas li hemberî krîzan yekgirtî, yekhelwestî, rêxistinî û xwedî heman refleksa be, wê Kurd ji van krîzan bi awayekî serkeftî derkevin. Lê belê heke berovajiyê vê rewşê be, dibe ku deskeftiyên xwe yên heyî jî winda bikin. Lewra ya dikeve ser milê hemû partî, tevger, rêxistin û kesayetên Kurdî xurtkirina yekrêziya Kurdan e. Divê xebat hemû di vê çarçoveyê de bin da ku hêzên herêmê ji parçebûna me sûd wernegirin ku sed salên din jî me bê statû bihêlin.

Lê belê divê bê destnîşankirin ku xala herî nazik û qels a kurdan parçebûna hiş û mejiyê kurdan e ku bi taybetî dewletên herêmê her tim vê birînê kûr dikin. Lewra dema Kurd di vê çarçoveyê de nêzîkê hev dibin gotegotên berhewa li nav Kurdan belav dikin. Li ser meselê piştî daxuyaniyên Rêber Apo û tevgera azadiyê, taybetî ew kesên her tim li dijî wan ji bo manipûlekirinê ketin nav liv û tevgeran. Taybetî li ser medya dijîtal li dijî tevgera azadiyê asta heqaretên xwe bilind kirin. Her wiha lîsteyên kuştinê belav dikin û qaşo dema pêvajo têk biçe, wê ew kes bêne kuştin. Di çarçoveya vê mijarê de li ser medya dijîtal dubendiya Kurdan zêde bûye û Kurd ji hev dûr ketine. Armanca van nîqaşan pêşîlêgirtina nîqaş û gengeşiyên li ser rewşa yekrêziya Kurdan û azadiya Kurdistanê ye. Wekî tê zanîn li Rojavayê Kurdistanê konferansa yekrêziya Kurdî pêk hat, di heman demê de ji bo yekrêziya di navbera partiyên Kurdistanî yên Rojhilatê Kurdistanê de jî li ewropayê konferansek pêk hat. Bêguman piştî van her du konferansan nîqaşên li ser medya civakî balkêş in û diyar in ku ji heman navendê derdikevin. Ji bo ev hêz negihijin armancên xwe divê Kurd têkoşîna xwe bilindtir bikin û ciavaka Kurd di hêla manîpûlekirina pêvajoyê de hişyar be. Ji bo vê jî pêwistî bi agahiyên rast li ser pêvajoyê heye.

Ji bo rewş baştir bê zelalkirin, ez dixwazim di çarçoveya du têgehan de vê pêvajoya heyî binirxînim ku ev her du têgeh xalên sereke yên pêvajoyê ne. Û her wiha Rêber Apo jî pêvajo li ser van her du têgehan raber kir. Têgeha yekê aştî ye ku di navbera du hêz/kesan de pêk tê. Bêguman ji bo aştî pêk bê, rêgeza yekemîn jî hevqebûlkirin e. Ango ji bo aştiya di navbera Kurd û Tirkan de pêk bê, divê dewlet bi awayekî siyasî hebûna Kurdan qebûl bike. Rûniştina derdora heman maseyê tê wê wateyê ku êdî hemû argûmanên dewleta Tirk ên li ser înkara Kurdan berhewa çûn. Ango ji bo serastkirina çewtî û xeletiyan nîqaş bivênevê ye. Bi vê pêvajoyê dewleta Tirk çewtî û xeletiyên xwe her çiqas bi nav neke jî qebûl dike. Têgiha duyem jî demokrasî ye ku yekser têkiliya wê bi têgiha azadiyê re heye ku di demokrasiya rast de nîqaş, gengeşî, mafê azadiya derbirînê, parastina statûyeke cuda û hwd. hene.

Lewra pêwistî pê heye ku têkiliya di navbera van her du têgehan de di çarçoveya bikaranîna Rêber Apo de bê nirxandin. Bêguman azadiya gelekî an jî ya civakekî ti hêz bi dilê xwe radestî civakê nakin. Civak an jî gel azadiya xwe bi têkoşîn û berxwedanê bi dest dixin. Lewra ji bo azadiya Kurd û Kurdistanê jî her du xal derbasdar in. Heta vê pêvajoyê Kurdan heta astekî berxwedan û têkoşîn meşand. Lêbelê azadiya xwe bi dest nexistin. Di vê pêvajoyê de amûrên azadiya gelê Kurd tên guhertin ango têkoşîn û berxwedan wê di asteke bilindtir û bi amûrên cudatir bimeşin. Lewra mirov dikare bibêje ku di armancan de guhertin tune ye, tenê rê û rêbaz veguherin.

Welhasil heke di nav demokrasiyê de mafê xwerêxistinkirinê û azadiya derbirînê tune be, bêguman mirov nikare qala demokrasiyê jî bike. Mafê xwerêxistinkirinê di nav xwe de hemû mafên Kurdan ên civakî dihewîne. Gelo li devereke zimanê Kurdî qedexe be an jî ne zimanê perwerdehiyê be, mirov dikare behsa demokrasiyê bike? An jî devereke ku Kurd nikaribin xwe birêxistin bikin, wê çawa li wê deverê qala demokrasiyê bê kirin? Her wiha devereke ku Kurd nikaribin qala serxwebûna Kurdistanê an jî federalîzmê bikin, wê çawa li wir qala azadiya derbirînê û demokrasiyê bê kirin? Bi kurt û kurmancî devera azadiya gel, civak û kesan lê, demokrasî lê heye. Berovajiyê vê ne pêkan e ku mirov qala demokrasiyê bike. Lewra azadî ji bo demokrasiyê armanca sereke ye. Di vê çarçoveyê de fîlozofê alman Habermas dibêje ku demokrasî di qada gelemperî de bi şert û mercên wekhev tevlêbûna kesan a nîqaşê ye. Heke Kurd di şert û mercên wekhev de derkevin qada gelemperî wê karibin guherîneke mezin di nav civaka Kurd û Tirk de ava bikin. Demokrasiyeke rast di nav xwe de danûstandina ramanan bi awayekî azad û rasyonel dihewîne. Lewra di demokrasiyeke rast de wê manîpûlekirina Kurdan ewqas ne hêsan be. Di vê çarçoveyê de demokrasî ji bo azadiyê amûrek e. Ji bo azadiya Kurd û Kurdistanê demokratîkbûna civakên din gavek e. Lê ne armanca sereke ye.




# Tevlêkirina gel girîng e

Bi kinayî gava pêvajo baş were xwendin, wê bê dîtin ku tiştên Birêz Ocalan ji dewletên dagirker dixwaze tev di danezana mafê mirovan a gerdûnî û peymana mafê mirovan a navnetewî de hatine nivîsandin û wek şîrê dayikê li gelê Kurd helal in



Hesen Huseyîn Denîz



Li ser bingehê Kurdistanê û çareseriya pirsgirêka Kurd li Rojhilata Navîn şer û pevçûneke îdeolojîk, siyasî, civakî û netewî heye. Ji aliyekî ve Kurd dixwazin piştî siyaset û pêkanînên înkar û îmhakirina ev sed sal in didomin, bi awayekî xwe ji vê rewşê bifilitînin û hebûna xwe di astekê de bi hêzên dagirkerên Kurdistanê bidin pejirandin. Rê him li ber qirkirin û asîmîlasyona Kurdan bigirin û him jî ji Kurdan re bingehekî azadbûnê deynin. Bi taybetî di van pêncî salên dijwar ên şerê bi dewleta Tirk re derket holê ku kes nikare kesî têk bibe.

Ne dewleta Tirk dikare vîna gelê Kurd bişikîne û ne jî gelê Kurd dikare dewleta Tirk têk bibe. Ev rewş dikare sed salan jî wiha bidome û qet çareseriyê bi xwe re neyîne. Gelê Kurd fedekar e, leheng e, dilsoz e, canfeda û bawermend e. Maleke Kurdan a ku êşa van pêncî salan nekişandiye nemaye. Hîn jî amade ye berdelên giran bide. Lê heta kengî? Divê li ciyekî bînvedaneke çareseriyê roniya xwe bide der, ku gel karibe, ji vê ronahiyê ber bi rojê ve awirên xwe dirêj bike. Gel azadî û rizgariyê dixwaze. Îroj Kurdekî, ku welatekî azad ê bi navê xwe, nasnameyeke li ser navê xwe û sazûmaneke xwe bi xwe birêvebirina xwe pêk bîne, nexwaze tine ye. Ev xeyala her Kurdî ye. Bêguman gotina me ji bilî kesên xwefiroş, cahş, noker û sîxurên dagirkeran e. Ji bilî van tevan her Kurd dixwaze li cîhanê bi rûmeta xwe ya netewî bijî. Li ser nasnameya xwe navê xwe Kurd, zimanê xwe Kurdî, welatê xwe Kurdistan were nivîsandin. Kurd çi di nav sazûmana Tirkiye, Îran, Sûriye, Iraqê de bin, çi li giştiya cîhanê ji Japonya heta Amerîka yê, ji Afrîqa heta Ewropayê belav bûbin, ew dixwazin wek Kurdên ji Kurdistanê werin naskirin û ev yek çawa ku mafê her mirovî ye, bêguman mafê her Kurdekî/ê ye.

Di vir de hin kesên pêvajoya birêz Ocalan şaş fêhm dikin, dibin sedema şîroveyên şaş û dibêjen qey Birêz Ocalan bangî Kurdan kiriye û gotiye werin bibin Tirk. Di rastiyê de ti bangeke an niyeteke Birêz Ocalan a wiha tine ye. Ew dibêje, me nikarî dewletên cîran bi rêya çekê têk bibin, me ew westandin, em jî westiyan êdî wê demê em wana bikişînin ser rêya însaniyet û demokrasiyê, da ku rê li ber înkar û qirkirina Kurdan bigirin. Birêz Ocalan nabêje, werin em tev bibin Tirk û bila ev mesele ji holê rabe. Lê gava hin kesên dixwazin Birêz Ocalan şaş fêhm bikin diaxivin û wî şaş şîrove dikin, wê demê ew serê gel tev li hev dikin û sedî sed nizanin çi dibêjin. Kes nikare genetîka miletekî bide guhertin. Ger ev sed sal in di bin ewqas zilm û zordariya Tirk, Ereb û Farisan nikarîbûn genetîka Kurdan biguherin û wan bikin Tirk, Ereb û Faris, îro jî ti kes nikare paşnavê Kurdan bike Tirkiye. Navê Kurdan Kurd, paşnavê Kurdan Kurdistan e. Kurdistan erdnîgariyeke ji morovahiyê re dergûşî kiriye û ew ji hezarên salan û vir ve welatê Kurdan e. Ger Kurd biryara xwe bidin û bi Tirkan, Ereban, Farisan re di nav hev de bi awayekî demokratîk bijîn, ew nayê wateya dev ji Kurd, Kurdî û Kurdistanê berdin û di daxwaza birêz Ocalan de jî bangek an peyameke ku Kurd dev ji Kurdîtiya xwe û welatê xwe berdin tine ye. Îroj Ewropa ji hemû Ewropiyan re bûye welatekî berfireh; Alman, Holandî, Frans, Îtalî, Grekî û gelek netewên din bi hev re dijîn, sînorên navbera xwe rakirine. Lê ne Fransiyek dibêje ez Alman im, ne jî Îtalyanek dibêje ez Fransî me. Her yek bi rengê xwe, dengê xwe, nasnama xwe, welatê xwe bi yên din re bi rêzgirtina li mafên hev, di nav aştî, demokrasî û aramiyê de dijîn. Tişta Birêz Ocalan ji Kurd, Tirk, Ereb, Faris û miletên din dixwaze jî ev e û ev yek ji xwe di zagonên navnetewî yên mafên mirovan de hene:

***1-*** Mafê tayînkirina qedera xwe- Ji peymana Mafên civakî û siyasî ya navneteweyî:

Mafê her gelî yê tayînkirina qedera xwe heye. Li gor vî mafî gel statuya xwe ya siyasî bi awayekî azad diyar dike, pêşveçûna xwe ya aborî, civakî, çandî bi xwe pêk tîne.

(Birêz Ocalan jî dibêje, divê gelê Kurd sazî û rêxistinên xwe xurt bike, di warê aborî, civakî û çandî de valahiyekê nehêle û bi ser de partiya DEMê rexne dike ku çima rêjeya ji % 20ê dengên li Tirkiyê nastîne.) Ger em dibêjin li Tirkiyê 30 milyon Kurd hene, wê demê çima dengê van Kurdan nayên stendin. Pir diyar e, ku partî danakeve nav gel, ji raya gel napirse, gel tev li xwe û pêvajoyê nake. Mînak, di pêvajoya birêz Abdullah Ocalan da destpêkirin de, kî daket nav gel, bi gel re gotûbêj kir, kê nêrînên gel pirsî û kê li nav gel anket an referandûmek kir, bê ka gel çi dixwaze û ewê xwe çiqasî tev lê pêvajoyê bike? Partiya DEMê dixwaze bi dîplomasiya di navbera partiyên îktîdar û mûxalefetê de, li ser navê gel xwe bike xwediyê gotinê. Lê ev ne rast e. Divê dakeve nav gel û bi gel re bide û bistîne. Xwe nexe şûna gel û li ser qedera gel biryaran nede. Gava birêz Ocalan dibêje, hûn min fêhm nakin, ew qala dûr û kûrbûna di navbera gel û partiya DEMê de dike).

***2-*** Birêz Ocalan dibêje, divê Kurd bibin hemwelatiyên wekhev. Ev tê wateya ku çi tişta Tirkan, Ereban, Farisan hebe, divê ew tişta Kurdan jî hebe, Ev yek jî di zagona di danezana mafên mirovan de heye, ku mafê herkesî yê bibe hemwelatiyê welatekî heye. Divê bi awayê hiqûqî Kurd bibin hemwelatiyên wekhev. (Birêz Ocalan ji bo vê xalê jî nabêje, ji bo Kurd bibin hemwelatiyên wekhev bila xwe bikin Tirk, Ereb, Faris, dibêje, divê Kurd bi nasnama xwe, bi zimanê xwe, bi çanda xwe werin pejirandin û bi mirovên din re xwediyê heman mafan bin, da ku karibin bi hev re azad bijîn).

***3-*** Dîsa di danezana mafên mirovan a gerdûnî de tê gotin ku: Mafê herkesî yê jiyandina ziman, çand û nasnameya xwe heye. (Birêz Ocalan jî dibêje astengiya li ber ziman, çand û nasnameya Kurdî rakin û hebûna Kurdan bipejirînin).

***4-*** Mafê parastina ji cudakariyê wekheviyê ya danezana mafê mirovan a gerdûnî rê nîşan dide, ku divê ti kes ji ber cins, nijad, ziman, ol, reng û koka xwe li rastî cudakariyê neyê. Lê ev sed sal in dewletên dagirkerên Kurdistanê ev xal binpê kirine (û niha birêz Ocalan bangî van dewletan dike û ji wan dixwaze dev ji vê cudakariyê berdin. Bi vê sedemê dibêje xala «qezenc bike, bide qezenckirin» were bicihanîn. Tu hebûna Kurdan qebûl bike, Kurd jî dev ji şerê li hember te berdin, tu çiqasî mirov bî, Kurd wê ewqasî bi te re bijîn, tu çiqasî neyar bî, Kurd wê ewqasî li dijî te bin).

***5-*** Mafê tevlêbûna civakî û siyasî ya peymana mafên siyasî û medenî dide zanîn, ku divê herkes tev lê karûbarên raya giştî bibe, karibe xwe birêxstin bike, nûnerên xwe hilbijêre, partiyên xwe damezirîne û xwerêvebiriyên nişteyî wek şaredarî, komun û hwd. saz bike. (Tişta birêz Ocalan jî di vê demê de ji gel dixwaze xwebirêxstinkirin û xurtkirina komun û şaredariyan e, ku gel karibe xwe bi xwe, xwe bi rê ve bibe).

Bi kinayî gava pêvajo baş were xwendin, wê were dîtin, ku tiştên birêz Ocalan ji dewletên dagirker dixwaze tev di danezana mafê mirovan a gerdûnî û peymana mafê mirovan a navnetewî de hatine nivîsandin û wek şîrê dayikê li gelê Kurd helal in û mafê gelê Kurd heye ew jî wek miletên din qedera xwe bigire dest xwe û bi ziman, çand û nasnameya xwe were nasîn. Ji bo wê, divê her gotina li ser navê gelê Kurd were gotin bi gelê Kurd re were gengeşekirin, raya wî were stendin û kes xwe nexe şûna gel berê pêvajoyê bi ciyekî derveyî rastiya gel ve neyê kişandin. Ger gelê Kurd îroj wê bi gelên herêmê re, sibe bi gelên cîhanê re bi hev re bijî, ew ê bi nasnameya xwe ya Kurd, zimanê xwe yê Kurdî û erdnîgariya xwe ya Kurdistanê bijî. Divê birêz Ocalan rast were fêhmkirin.






Kurdistan Lezgiyeva

## Bûyerên balkêş li Gurcistanê

*Li Gurcîstanê bi çalakiyên protestoyî û bi provakasyona bikaranîna hêzê, hewl tê dayîn ku encama hilbijartinê bê rastkirin. Ji bo serkeftina taktîkên wiha du şert hene. Lê guman hene ku ew li Gurcistanê pêkan in.*

Ji dema "şoreşên rengîn" ve helwest baş tê zanîn. Partiya desthilatdar di hilbijartinan de serkeftina xwe îlan dike. Mûxalefet jî xwe dispêre piştgiriya ''exlaqî û siyasî'' a Rojava. Encamê nas nake. Bi çalakiyên protestoyî û provakasyona bikaranîna hêzê, hewl tê dayin ku encama dengdayînê bê sererastkirin.

Ji bo serkeftina taktîkên wiha du şert hene. Ya yekem helwesta çalak a patronê derve ye ku bi awayên cuda zextê li desthilatdaran dike. Ya duyemîn jî ev e ku rayedar vî patronî ew qas girîng dibînin ku xeternak e û nayê qebûlkirin ku têkiliyên bi wî re bi giranî tevlihev bikin.

**Bi tenê, amadebûna hêzên derve ye ku bi awayekî cidî tev li rewşê bibin. Û baweriya derdorên desthilatdar ku li berxwedanê ancax heta astekê dikare li ber xwe bide, wê demê divê paş ve gav biavêje.**

Bername, bêguman, pir hêsan e. Lê niha, bi gelemperî, tevlihevî ne bi rûmet e. Her kes dixwaze ku berê tev bigere. Guman hene ku ev her du şert li Gurcistanê pêkan in.

YE û DYE rexne li Partîya Xeyala Gurcistanê dikin û nerazîbûna xwe yên zêde li dijî vê rêbazê nîşan didin. Tedbîrên sembolîk têne girtin. Wekî cezayên ragihandinê û rawestandina pêvajoya endambûna Yekîtiya Ewropî derdixin pêş. (Ev bi rastî ne pêkan e). Di hawîrdora medyaya Ewropî-Atlantîk de, nakokiya Gurcistanê di kategoriyên "pro-Rûsya- Pro-Rojava" de tê binavkirin, ku têgihîştina xwe tenê bi şeklê hevrikiya jeopolîtîk nîşan dide (bi xwezayî, kes guh nade rewşa Gurcistanê). Di prensîbê de, şertên ji bo destpêkirina qeyranê pir maqûl in.

Lê, bi gelemperî, eşkere ye ku Ewropa û Dewletên Yekbûyî niha bi hûrgulî, tiştên girîngtir hene ku bikin. Di halê hazir de kes heyecana rastîn a ku di salên 2000î û destpêka salên 1900î de li ser welatên cihê hebû, piştî Sovyetê êdî hîs nakin. Îlhama veguheztina cîhanê bi îxracê bi dawî bû û bêyî îlhamê tiştên weha tevlihev naxebitin.

Di derbarê helwesta hukûmeta Gurcistanê de, di heman demê de tirsa razber a berbiçav ji hevkarên payebilind tune, ku dê wan neçar bike însiyatîf û niyeta xwe sînordar bikin. Siyaseta Tiblîsê ya li dijî Rojava ji sala 2022yan û vir ve ne tenê serbixwe ye. Lê li hinek cihan jî wêrek e. Xuya ye ku Îvanishvili û hevkarên wî fêm dikin ku Rojava ne tenê xwedî pêşîniyên cûda ye, lê di heman demê de hinek derfetên cûda jî hene. "Xeyal" pê bawer e ku piraniya nifûsê, ne bi qasî alîgirên opozîsyonê, bi rastî piştgirîya wê dike. Li Gurcistanê, berovajî çend welatên din ên Yekîtiya Sovyetê ya berê, pêşbaziya siyasî heye, her çend desthilatdar her dem û li her deverê, bêguman bi serê xwe heye.

Wek encam jî dema ku dor tê ser pêşerojê, ti rewşek heyî ji berê ve nayê diyarkirin. Gurcistana nûjen, serbixwe û ramyarî, dikare di bin bandora faktorên yên rasthatî de ber bi xirabiyê ve biguhere. Gelê wê dikare mafê diyarkirina çarenûsa xwe ji nû ve bi dest bixe. Eger bi hêza xwe bawer be û pişta xwe nede hêzên derve. Bi heman awayî, em niha nikarin bi baweriyeke tam li ser perspektîfên polîtîkayên derve yên welatên din ên Transkafkasyayê û Asya Navîn binirxînin. Têkiliyên navneteweyî bi gelemperî bi domdarî û îstîqrarê nayên diyar kirin.

Ya girîng ev e ku hewldanek ji bo pêdaçûneke bi hêz dikare bê kirin. Ji ber ku dijberê sereke hîn serokê niha ye. Lê, şertên serketinê ne pir xweş in. Lê, di jiyanê de, wekî ku wan di Yekîtiya Sovyetê de digotin, her dem cîhê qehremaniyê heye.

# Şiyarbûna derûnî ya Rojava

**Zêdebûna fermandar û siyasetmedarên jin li Rojava hem şoreşeke nasnameya takekesî û hem jî civakî derxist holê. Beşdarbûna jinan di şoreşê de psîkolojiya kolektîf temsil dike**

Prof. Dr. Abdulîllah Polat

Derfetê civakî yên ku li Rojhilata Navîn derketine holê, bi taybetî bi Bihara Ereban re, pir kûr û tevlihev in ku bi çalakiyên siyasî an leşkerî ve sînordar bibin. Di nav vê pêlê de, Şoreşa Rojava bûye navenda serhildaneke psîkolojîk a kolektîf li dijî zordariya nasnameya dîrokî ya gelê kurd. Modela rêveberiya demokratîk û xweser a li Rojava hatî damezrandin ne tenê projeyeke siyasî ye, lê di heman demê de pratîkeke dermankirina psîkolojîk a piralî û rizgariyê ye ji bo gelekî ku demek dirêj di bin tundûtûjiya dewletê, înkar û asîmîlasyonê de ye. Nasname asta herî kûr a wateyê ye ku kesek ji bo xwe ava dike. Nasnameyeke ku bi trawmatîk hatiye marjînalîzekirin, şermezarkirin û ji bîra civakî hatiye derxistin, di hundurê xwe ya kesane û civakî de hesteke domdar a nakokî û kêmasiyê diafirîne.

Nasnameya kurdî ku ji hêla dewletê ve nayê naskirin û pir caran ji hêla civakê ve tê înkarkirin, bi nifşan rastî zordariya psîkolojîk a sîstematîk hatiye. Ev ne tenê zordariya fîzîkî, lê di heman demê de bêqîmetkirina domdar, tirsandin, nebûna aîdiyetê û têkbirina xwebaweriya kolektîf û kesane jî vedihewîne. Şoreşa Rojava bû navê pêvajoyekê ku tê de ev zincîrên psîkolojîk bi hev re hatin şikandin û xweya takekesî û civakî bi rêya rizgarbûna ji tirsê hate azadkirin. Ji guhertineke derveyî ya desthilatdariyê wêdetir, şoreş vejandina ramana azadiyê ya takekesî di cîhana hundirîn a mirov û di bîra civakî de ye.

Trawma û bêçaretiya fêrbûyî ya ku ji ber tepeserkirina nasnameyê şekil girtibû, li Rojava bi kiryareke girseyî ya "parastina xwe" dest pê kir ku were derbaskirin. Niha têkoşîn ne tenê li dijî dijminekî derveyî, lê di heman demê de li dijî tirs û şerm, şerm û xwe-şermezarkirina navxweyî jî hate rêve kirin. Ji bo şikandina mohrên nasnameya tepeserkirî cesaret lazim e, ji ber ku nasnameya tepeserkirî di mirovan de kompleksek kêmasiyê ya mayînde diafirîne. Tiştê ku li Rojava tê jiyîn serhildaneke kolektîf e tam li dijî vê yekê. Takekes bêyî ku bi nasnameya xwe re li hev bike, pê serbilind be û bi eşkere bijî, nikare bi rastî azad bibe. Şoreşa li Rojava qîrîna gelê kurd e: "Em hene, em jî li van axan bindest in." Ew îfadeya siyasî ya azadiya giyanî ye. Ezmûna Rojava nîşan dide ku nasnameyên ku demeke dirêj e hatine înkarkirin di dawiyê de di bin giraniya tepeserkirina psîkolojîk de diteqin. Hemû xwestek, hêrs û hesretên hatine tepeserkirin bi heweseke kolektîf a kûr a ji bo têkoşîna azadiyê re dibin yek û vediguherin enerjiyeke civakî.

Ev serhildan ne tenê qada siyasî diguherîne, lê di heman demê de wêneya xwe ya mirovan bi bingehîn diguherîne. Serhildana kolektîf ji nû ve avakirina baweriya takekesî dihêle. Hişmendiya berxwedanê hesteke serbilindiyê ye ku li dijî şerm, înkar û tirsê radiweste. Her komun, her meclîs ne tenê ji nû ve avakirina rêxistina civakî ye, di heman demê de ji nû ve avakirina hişmendiya takekesê azad e. Di vê nokteyê de, pêdivî ye ku rola jinan were teqezkirin. Rizgariya jinan ne tenê bi wekheviya li ber qanûnê ve sînordar e. Zêdebûna zexta baviksalar ji bo her jineke kurd trawmayeke psîkolojîk a hîn girantir çêdike. Zêdebûna fermandar û siyasetmedarên jin li Rojava hem şoreşeke nasnameya takekesî û hem jî civakî derxist holê. Beşdarbûna jinan di şoreşê de psîkolojiya kolektîf a xwedîderketinê, şikandina zincîrên tirsê û nêrîna pêşerojê bi hêviyê temsîl dike. Her jineke azad di heman demê de ji bo zarok û mêran modeleke rolê ye.

Ev nûjenkirina tevahî ya psîkolojiya civakî ye, ji nû ve şiyarbûna xwerêzgirtinê, baweriya bi xwe û îradeya her mijarekî ku hatiye şermezarkirin û bindestkirin. Ji bo civatekê ku bi înkarkirina nasnameya xwe ve bijî, şoreşa herî mezin ew e ku derfetê bide wê ku "di rewşa xwe ya xwezayî de hebe". Îradeya ku li Rojava hatiye bidestxistin mîna psîkoterapiya kolektîf e. Ew vegera li xweya windabûyî ye, îfadeya hestên ku bi salan hatine tepeserkirin, veguherîna şermê bo serbilindiyê ye. Li vir, serhildana civakî bi şiklê şerekî mezin ê psîkolojîk li dijî şermezarkirin, bêqîmetiya navxweyî û tirsê girtiye.

Şoreşa Rojava pratîkeke rizgariyê ye ku tê de avakirina nasnameya siyasî, kolektîf û psîkolojîk bi hev ve girêdayî ne, û mirov hem di asta civakî û hem jî di asta takekesî de xwe ji nû ve diafirînin. Nasname ne mijareke bi tevahî siyasî ye, lê birîneke giyanî ye. Azadî hem şîfaya civakî û hem jî ya psîkolojîk e. Ji bo gelê kurd, Rojava ne tenê erdnîgariyek e, vejîneke ku tê de zincîrên hundurîn têne şikandin û serhildana psîkolojîk û baweriya bi xwe şiyar dibe.




# Pedagojî

Dr. Rodî Zinar

Di vê nivîsê de û di çend nivîsên li pey hev de em ê li ser perwerdeya zarokan û têkiliyên bi malbatê re bikin ku pêşeroja zarokan ya herî zêde di malbat û di dibistanê de tênê têşekirin, an têne derbkirin û ji ber heman hincetan em ê li ser têkiliya bi zarokan re bisekinin.

Di jiyana zarokan de birçîbûn a têkiliya bi malbatê re hebe; dê bi domdarî bandorê li derûniya zarokan bike û dê zarok bi domdar di bin heman bandorê de bijî. Divê navbera zarok û dayikê başbe an zarok ji têkiliya dayikê têr be ku li dibistanê hevalên xwe pehîn neke û wan ne êşîne.

Li dibistanê hevalên xwe diêşîne, dev li wan dike û li dibistanê kêm baldariyê dikişîne. Di bingeha heman tevgêran de pirsgirêkên hestyarî hene. Di hêmanê de kêmaniyek heye ku heta ew hêman rast neyê temamkirin, dê bi domdarî astengî derkeve holê.

Ger ku jin û mêr bi hevdu re şer bikin û jin ji mêr re an mêr ji jinê re bibêje ez ji te of bûme, êdî ez ji te hez nakim û zarok vana dibihîze, ev tiştan li ser derûniya zarokan bandoreke neyînî çê dike.

Divê bê zanîn ku heta pirsgirêkên hestiyar tune bin; dê pirsgirêkên tevgerî dernekevin holê û heman tevgêrên bi pirsgirêk; bingeha xwe ji problemên kêmbûna hestyarî digire.

Ger ku kes an zarok xwestekên wan ên hestiyarî bêne bicihanîn; wê demê kes an zarokekî aram, ji xwe bawer dê derkeve pêşberî mirovan.

Xwe girêdana ku li vir mebest e; xwestek û bersivdayîna hestiyariya zarokan an ya kesan e. Li vir her du hêl an çend alî, hevdu li ber çavan digirin, ji hevdu hezdikin, hevdu temam dikin, li hember pêdivîtiyê ji alîkariya hevdu re diçin, em behsa xwe girêdaneke wisa dikin.

Di tevahî lêkolînan de derketiye holê ku pirsgirêk; kêmbûna xwe girêdana li hember hevdu ye. Mînak: Tu li kuçeyê bi şaşî pê li lingên yekî bikî, tu yê kulmukekî bixwî. Ev tevger ne ji ber canê wî/ê êşiyaye! Ev ji ber ku xwestekên wî/ê yên hestiyarî di zaroktiyê de nehatiye pêkanîn û ji ber ku hişk e, şidiyayî ye yan agresîv e ku kulmukekê (humukekê) dawdişîne kesê li hemberî xwe.

Di malbatê de bang heye ku divê zarok negire hembêza xwe, ji ber ku karê malê heye û divê ev kar bêne kirin, lê bes pêdiviya zarok ji heman hembêzê heye û pêdivî bi raketin a bi dayikê re heye ku xwe di ewlehiyê de bibîne, an ji bo xwe di ewlehiyê de hîs bike pêdivî bi heman hembêz û raketinê heye.

Di nêzîkbûnên di salên 1980ê de raketin a bi dayikê re pêşniyar nedibû, ji ber ku çend zarok di hembêza dayikan de fetisî hatibûn dîtin. Lê zarok di hembêza dayikê de digehêje ewlehiya xwe û pêdivî bi heman ewlehiyê heye. Ji ber ku zarokên di ewlehiyê de gihiştibin; xwedî malbatên aram û aştiyane ne. Ji ber heman diyardeyan; zarokên li hember, aram û bi xwe ewlene ku ji malbatê re nabin pirsgirêk.

Zarokekî xweşpeyv an xweş têkilî, malbat ji çavan ditirse ku divê zarokên me yê çavnokî bibe û heman zarokan nebaş rêdidin ku ev jî li ser derûniya zarokan bandoreke neyînî çê dike. Lê divê bê zanîn ku pêdiviya zarok bi reşbîniyê nîne û pêdivî bi alîkariyê heye.

Zarokekî evqas aram, gelo çawa gihiştiye ku evqasî bi xwe ewle û aram e? Lêdan xwariye an bi peyvên tirsdar û neyînî xwe jîn girtiye? Na! Hew xwestekên wî/ê yên hestiyarî hatine pêkanîn. Ger ku xwestekên zarok yên hestiyar di dema xwe de werin pêkanîn, zarok aram e. Zarok şanaz e. Zarok bi xwe re aş e.

Yên ku xwestekên zarok pêktîne bi piranî dayik e ku mijarê em li ser nêzîkbûna dayikê dihûnin. Dema ku zarok dayikê dimije tenê pêdiviyên xwe yên fizîkî pêknayne; di heman demê de xwestekên xwe yên fizikî û yên hestiyarî, derûnî jî pêktîne. Dibe xwediyê kesayeteke bi hêz û sekneke zexm.

Dayik an kesên ku têkiliyê bi zarok re datîne divê xwedî dengekî nerm be ku dilê zarok şayitok bike, anku dilê zarok şanaz bigire. Divê dengekî xwezayî be, an ne xwedî dengekî bi fikar, an gefxwar be. Ji ber ku dengê bi xem, an gefxwar ji xwezaya xwe derdikeve, zirav dibe. Dengê ku xwesteka zarok re dibe bersiv, divê dengekî zelal û aram be ku bandoreke erênî li zarok bike û zarok di nava tevgera têkiliyan de bigire. Dengê bi fikar be an gefxwar be, têkiliya bi zarokan re asteng dike û divê kesên têkiliyê bi zarok re datîne ji heman dengî dûr bisekine.

Girêdanî rewşeke ku xwe bi dilxwestinî bera nava pêvajoyê dide, xwe bi dilxwestinî û bi hestiyarî berî nava rehê têkiliyê dide ye. Kesê ku bi zarok re têkilî deyne divê xwedî dengekî qedîfe be, dengekî ji dil, nerm û kûr be.

Zarokên ku xwestekên wan ên hestiyarî hatibin pêkanîn tevgerên wan aram dibin, sererast dibin. Ji ber ku tevger di pey demekê re derdikeve holê. Tevger encam e. Sererastkirina ji bo tevgeran wêdetir e. Divê amadehiyên bersivdayîna xwestekan bêne kirin ku zarok birçî nemîne. Dema ku zarok mîna mêvanekî di hundur de neye dîtin; divê nêzîkbûna li dijî zarok fêhmber be û nerm be. Kesê ku bi zarok re lêdanê terbiye bibe, ji xwe ew zarok ne bi terbiyeye û peyva terbiyeyê ji bo ajalan tê bi karanîn ku zarok zindiyeke cuda ye. Ne ajal e.

Exlaqê di civakê de divê di pey pêvajoyeke bi hevdu re zarok bigire. Exlaqdayina bi darê zorê zarokan nake xwedî exlaqekî mirovî. Ji ber ku zarok ne ajal e û peyvê fêhm dike, bi heman fehmkirina aram, frontal korteksa zarokan bi fêhmkirinê, bi dan û stendinê pêş dikeve, peyvan digire an xwe têrtije dike.

Divê zarok ne tiştekî ku tu xwe di ser wan re derînî aramiya ku tu hêvî dikî, an ne ajaleke ku tu hestên xwe yên seydvaniyê li ser wan biceribînî bin. Ji ber ku zarok navgîna jiyanê bi xwe ye. Ne hespa tu bi qamçî bibezînî, (Marîa Montessorî dibêje) "tu hesp, hespa li xwezayê azad direve derbas nake."

Di perwerdeya zarokan de her der ne gul û gulîstan e, her der ne cejna 14ê Nîsanê û ne demsal biharê ye. Ji xwe ev nêzîkbûn ne raste jî. Demên bandor û bertekî hene, destpêk û encam hene, ahengîsaziya tevger û hunandinê heye. Rêbazê xelat û cezayê teqez heye ku ev jî xwedî rêbazeke çawaniyê (nerm an hişk) derdixîne holê. Di vê pêvajoya dilzîz de, rêbazên nêzîkbûnê geleki girîng in. Zarok ne malê te ye, kes e û divê tu bi serde neqîrî, ji ber ku ew jî kes û bi serê xwe ye, divê tu hestên zarok neşkênî.

Ji bo ku zarok xwestekên xwe yên hestiyariyê, yên ewlehiyê bibersivîne; divê xwe di ewlehiyê de bibîne. Carinan dayik an bav dibêje zarokê min bertekî tevdigere. Lê bes te tiştekî ku zarok xwe jê dihefizîne an diparêze gotiye ku zarok bertekî tevdigere. Ji bo ku zarok xwe di ewlehiyê de bibîne divê bi navê wî/ê xîtap bike yê ku li zarok dinêre. Kî dibe bila bibe, divê bi zarok re mîna ku di asta hevdu de ne tevbigere, divê naverokeke di asta hevdu de bê axaftin, divê di asta hevdu de rûnên û bikaribin bi hevdu re şîrove yên guncan bikin, bi hevdu re çay vexwin, bi hevdu re xwarinê bixwin.

Tiştên ku mirovan nêzî hevdu dike û ji hevdu dûr dixe denge, ji ber heman diyardeyê divê deng ewlehiyê, baweriyê an aramiyê bide mirovan, ji ber vî awayî dan û stendinda di nava xwe de deng gelekî bandorker e.

Pedagojî têkiliyeke mijar a têrtije bûna hestyariya mirovan e an dîtin a rewşa derûniya mirovane. Dema ku di navbera jin û mêr de pirsgirêk hebe, dê nekaribin bi zarok re têkildar be û xwestekên zarok bibersivîne. Pedagojî ne mijara rayedariya li ser zarok e. Mijara, rêbaz a ku zarok bikaribe xwe bi rêve bibe ye.

Di serdemê de zarok destê xwe, tiliya xwe bimêje normale, lê dema ku zarok bi ser lingan ketibe û destê xwe an tiliya xwe bimêje; divê mirov bibîne ku çima destê xwe, an tiliya xwe dimêje, divê mirov li sedemê wê binere an bigere.

Axavtina bi zarok re; divê xwedî misuxuriyê be ku mîna ji zarok re bibêje! Herdem ez bi destê te digirim ku tu xwe di ewlehiyê de dibîne, lê tu jî bi destê min bigire ku ez jî xwe di ewlehiyê de bibînim, dê gelekî xweş be, ev jî haydariyeke cuda bi zarok re çê dike.

Zarok lîstika ku dileyize; di pey demekê re dikeve nav lîstikê û xwe di wira de dibîne. Ger ku fêdeyê bide derdorê, dê pîvanên wan î rasteqînî baş rûnê û pîvanên wanî rast û şaş ji aliyê zarok ve bêhtir bêne dîtin. Tevgêrên rast dê zarokan di nava pîvanên rasteqîn de bigire. Ger ku domdar, an demeke dirêj di nava xeyalan de bimîne; dikare bibe xeyalperest, an belav bûna baladariyê dikare bibe serdest.


Divê mirov bizanibe ku zarok zû ji dayikê veqete; dê di her mijarê de pirsgirêkan bijî û zarok ji dayikê têr bûbe; dê ew ê bi xwe ji dayikê biqete. Lê dema ku zarok birçî bûna dayikê dijî û tu zarok ji dayikê veqetîne; dê zarokê şaşwaz bibe, heta dikare dengan jî tevlihevdu bike.

Divê zarok heta 2 saliyê teqez bi dayikê re bijî û divê ji dayikê neyê veqetandin.

Ger ku zarokê 4 salî tevgêreke neyînî rê bide û bertek nîşan bide û bale bikişîne ser xwe; zarokê ji bo heman bale bikişîne dê heman tevgêrê rê bide.


Ger ku zarok di 5 saliyê de şidetê bikar bîne divê mirov binêre ku "pirsgirêkeke derûnî heye an na binere," "gelo bikar anînan şiddete ji kesî hîn dibe heye an na," "gelo zarok ji navbera cihê ku lêye dijber dide an na."

Divê bêne zanîn ku zarokê duyemîn dibe sedemê pirsgirêkên girêdaniyê û divê ev mijar bi domdar di baldariyê de bimîne. Divê zarok di vê mijarê de bêne perwerde kirin, lê ji ber ku ne problemeke mayinde û esasiye, problemek demkî û derbasdare, divê zarok di mijarên esasî de mîna mehremiyetê de, di ya zayendî de bêne perwerde kirin.



# Serkêşîya Şêx Saîdî

Rixmo ke xoverdayîşê Şêx Saîdî ra pey seserre derbas bîye, mêrasê ey yê têkoşînî şarê kurdî rê îlham dano û raya ci roştî keno. Senî ke ey vera netewe-dewlete xover da, ewro zî vera serdestan têkoşîn domîyeno



Dr. Îsmet Konak



Xoverdayîşê Şêx Saîdî ra tepîya seserre vîyarte, hema zî tesîrê nê xoverdayîşî mîyanê şarê kurdî de domîyeno. Hema zî şarê ma bala xo anjeno înanê ke tewrê nê xoverdayîşî bîyî û bedelê giranî dayî. Tornê înan bêguman têkoşînê bapîr û dapîranê xo vîr ra nêkenê û bi xorînîye analîz kenê.

Xoverdayîşê Şêx Saîdî Amed ra heta Dêrsim û Erzîrom vila bîbî. Xeylêk merdimê namdarî beşdarê nê tevgerî bîyî. Înan ra yew Şêx Şerîfo ke cepheyê Xarpêtî rê fermandarîye kerde, bî. Şêx Şerîf eslê xo de dewa Kelaxsî ya qezaya Dara Hênî ya Çewlîgî de ame dinya. Ey Pali, Sêrt û Rojhelat de perwerdeyê medresa girewt û ziwanê sey osmankî, erebî, farsî û kurdî (kurmancî, kirmanckî) zanayêne. Şêx Şerîfî bitaybetî Şerê Dinya yê I. de Cepheyê Çewlîgî de sey fermandarê elaye pijiqnayîşê artêşa rûse de rolêko girîng kay kerd. Gama ke xoverdayîşê Şêx Saîdî dest pêkerd, Şêx Şerîf zî nêzdîyê nê tevgerî bî û 13yê sibata 1925î de Xarpêt de beşdarê xoverdayîşî bî. Badê ke tevger bin kewt, Şêx Şerîf anjîya herêma Az-Metanî û tîya de bi hetkarîya dewijan stargeh de mend. Çi heyf ke derheqê ey de îxbar virazîya, Şêx Şerîf tepişîya û sewqê Mehkemeya Îstîklalî ya Dîyarbakirî bî. Şêx Şerîf 29ê hezîrane de Amed de ame daliqnayene.

**Şêx Şerîf û Hesen Xeyrî Beg**

Seba mi nameyê Şêx Şerîfî xeylê muhîm o. Çike bapîrê mi Hesen Xeyrî Begî zî cepheyê Xarpêtî de Şêx Şerîfî rê hetkarîye kerde. No dem Hesen Xeyrî Beg dewa Huseynîkî ya Xarpêtî de mendêne.

Şêx Şerîf ey reyde pêvînayîş keno û derheqê tayê eşîranê Dêrsimî yê ke piştî nêdanê tevgerê Şêx Saîdî de gerre keno. Hesen Xeyrî Begî rê vano wa ê pîya eşîranê Dêrsimî rê mektubêke binusê û bierşawê. Netîce de mektubêke nusîyaye û bi nameyê Celalzade Mehmet Efendî erşawîyaye.

Na mektube şina Xozat û nêresena destê Celalzade Mehmet Efendî. Eksê ci kewena destê tirkan. Na mektube badê cû sey bahane ameye şuxilnayene, Hesen Xeyrî Beg û Celalzade Mehmet Efendî Teşrîna Peyêna 1925î de ameyî dardekerdene.

**Cuya Hesen Xeyrî Begî**

Lajê Murs Axayî Hesen Xeyrî Beg 1881 de dewa Axzunîkî ya Xozatî de ame dinya. Ey Axzunîk de perwerdeyê medresa girewt û dima ra serra 1892yî de Stenbol de Wendegehê Eşîran de perwerdeyê xo domna. Badê ke serra 1898î de Harbîye ra mezûn bî, artêşa Dewleta Osmanî de tayê wezîfeyî girewtî. Hesen Xeyrî Begî wezîfeyê leşkerî ra ber wareyê sîyasetî de zî ca girewt û parlamenterîye kerde.

**Cumleya peyêne**

Bi kilmî ruhê Şêx Saîdî yo xoverdayox na seserre de zî ma kurdan rê serkêşîye keno û raya ma roştî keno. Ey û embazanê ci seba azadîya Kurdîstanî bedelê giranî dayî û ma rê mêrasode bêhempa verada. Ganî ma qîymetê nê mêrasî bizanê û têkoşînê înan raver berê. Gama ke Şêx Saîd Amed de ame daliqnayene, cumleya xo ya peyêne wina bîye: "Ê do axê biza estrîyine biza bêestrîyine ra bivejê".

# Cinîyan reyde komelo demokratîk



Cemîle Turhalli





21-22yê hezîrane de Amed de bi şîarê "Bi yewîya cinîyanê kurdan ver bi yewîya neteweyî" konferanso 3yin o platformê yewîya cinîyanê kurdan bî. Tewir-tewir komelan ra û partîyan ra 101 cinîyê delegasyonî beşdar bîyî.

Cinîyan heme salone bi cilanê xo yê herêmî û bi rengê kesk û sûr û zerd û mor xemilnaybî. Konferansî destpêkî ra heta peynîye kurdkî dewam kerd û encamname zî kurdkî ame wendene. Cinîyê kurdî semedê awanbîyayîşê yewîya netewî de se bikerî û pawitişê kultur û ziwanî de rolê înan çi yo, têkoşînêkê hemparî senî bidê ser o xeylê qiseykerdiş û munaqeşeyî ameyî kerdene.

Nê konferansî de çar atolyeyî ameyî awankerdene û nînan ra yew atolyeya Hozan Mîzgîne yew zî atolyeya Şîrîn Elemhulîye bî, ê bînî zî atolyeyê Ferda Cemîloglû û Jîna Amînî bîyî. Nê her çar atolyeyan de goreba amancê înan ser o xeylê erjnayîşî virazîyayî. Mîsale atolyeya Hozan Mîzgîne de pawitişê kulturî de rol û mîsyonê cinîyan, atolyeya Jîna Amînî de her tewirê şîdet û qirkerdişî ser o rêbazê têkoşînî ameyî munaqeşekerdene.

***Nê munaqeşe û erjnayîşan ra qerarî ameyî girewtene. Nê qerarî nê yî:***

***1-*** Ganî semedê yewîya cinîyanê kurdan platformêk awan bibo. No zî bibo wesîleya yewîya neteweya kurdan.

***2-*** Ganî ziwanê kurdkî û kulturê kurdan bêro pawitene. Statuyê kurdan bi qebulkerdişê perwerdeyî dest pêbikero û ziwan tewir-tewir wasitayan reyde bireso nesilê neweyî.

***3-*** Semedê hemverê şîdetî tena têkoşîno huqûqî ney ganî têkoşîno komelkî zî bêro dayene.

***4-*** Aştî û awanbîyayîşê komelê demokratîkî de ganî semedo ke cinîyî rolê xo bîyarî ca, seba aye piştîyayewbînangirewtişê herêmî, neteweyî, mîyanneteweyî awan bibê.

Ma qebul bikerî ke bîyayîşê merdiman ra heta nika têkilîyanê cinîyan zereyê komelî de bi şeklêko xususî ca girewto. Cinîyî tena gedeyan nêanî dinya. Raşta merdim anî dinya la rolê înan o eslî, awankerdişê komelî û awankerdişê merdimî yo. Merdimîye bi xo nêbena, bi têkilîya keda hempare ya merdiman yew hişmendîya kolektîfe virazena, a zî tesîrê cuya merdiman kena. Na hişmendî vera-vera zanayîş û ciwîyayîşanê neweyan virazena û nê zanayîş û ciwîyayîşî helbet cinîyan reyde resenî nesilê neweyî.

Cinîyî gedeyan pîl kenî, erdê xo de citkarî kenî, semedê gedeyan vatişê estanekan ra dest pêkenî, deyîranê veyveyan vanî û vatişê xo heta mezelan dewam kenî. Vengê cinîyan bîyayîşê merdiman ra heta mergî qet nêbirîyeno. Wina aseno ke estbîyayîşê komelî bi rayîrşîyayîşê cinîyan taqîb keno. Nê rayîrşîyayîşî helbet cinsîyetperestîya camêrdan reyde hertim na rêxistînîye waşto ke biwedarno, cinîyan bikero wasitaya camerdan û tena înan sey leşe bivîno û înan ra madî îstifade bikero. Rolê cinîyan kerdî talî, hem leşa înan hem zanayîşê înan hem zî cuya înan ser o tehakûma girane viraştî.

Komelê kurdan de heta nika zî rolê cinîyan her ca de girîngîya xo bi şeklêko xususî xo mojneno. Nê rolê înan de cayê rolê aştî, cinîya kurde girewt. Wexto ke şer virazîya, çîta înan bena sebebê aştîya komelî. Deyîrê înan ge çiman ra hesire anî û ge zî merdimî keyfweş kenî. Pîzeyê merdimî mird kenî û ruhê komelî zî şaye kenî.


Semedo ke rolê cinîyan bêro fehmkerdene sey Şîrîn Elemhulî û Hozan Mîzgîne ma rê bi hezar serran ruhê mîrasê cuya kurdan nîşan danî. Nê hurdî cinîyan zî cuya xo de pêşengîya şarê xo kerde. Zanayîşê înan ra bigîrî heta hunerê înan, keda înan ra bigîrî heta têkoşînê înan ma rê mojneno ke cinîyî azadîya şarê xo vernîya her çî de vînenî, çunke semedê aye heta cuya xo ra zî fek veradanî.

Hozan Mîzgîne bakur de ameybî dinya. Heta bîye ciwane bi ziwanê dayîka xo deyîrê xo kurdkî vatêne. Wexto ke hunermendîye dest pêkerd, deyîrê xo bi îsyanê zerrîya şarê xo ra vatêne û zerrîya ma veşnayêne. Vatişê înan semedê ma hêzê mîrasê hezaran dayêne. Bawerî ardêne, hêvî ardêne, layê zereyê ma kerdêne laser, dara verê ma, ma rê kerdêne sîya daristanî. Deyîrê xo kerdîbî qîrênîya têkoşînê şarê xo. Deyîranê aye kurdî hewnê mergî ra weriznayî. Deyîrê sey 'Herne Pêş' semedê ma bîyî tifingê serê milê şarê ma. Deyîranê aye pêşengîya ma kerde, çimê mîlyonan akerdî û î resnayî nasnameyê înan. Wexto ke şehîd kewte, nameyê aye bi hezaran gedeyan rê ame dayene, deyîrê aye bi mîlyonan rê bîyî îlhamê xoverdayîşî.

Xoverdayîşê cayêkê bînî zî rojhelatê Kurdîstanî yo. Dewleta Îranî bi polîtîkaya fariskerdişî bi hezaran kurdî darde kerdî. Nînan ra yew zî Şîrîn Elemhulî bî. Şîrîn Elemhulî zî parçeyê Rojhelatî de ameybî dinya. Sey Hozan Mîzgîne zereyê aye de hertim îsyan est bî. Çunke cayê aye de zî polîtîkaya fariskerdişî kurdan ser o ameyêne kerdene. Seba aye, Elemhulî qet fariskî nêwaşt bimusa. Çunke înan ra vatêne ziwanê xo yê kurdkî ra fek veradê, kurdîya xo ra fek veradê bibê faris. Na teda û neheqîye aye qet qebul nêkerd. Verê xo da koyanê Kurdîstanî. Wexto ke ameye tepîştene, leşkeranê eceman ra sey Leyla Qasime celadê xo ra ef nêwaşt û çok nêrona. Celadanê aye nêveradayî a pawitişê xo kurdkî bikera. Vateyê xo yê peyênî nê yî: "Waşt ke ez kurdîya xo înkar bikera, labelê no xoînkarkerdiş hesibîyayêne, ez nê teslîmî qet qebul nêkena". Şîrîn Elemhulî û embazê aye wexto ke şîyî sêpîya îdamî bi marşê 'Ey Reqîp' no qerar pêşwazî kerd. Înan ziwanê xo ra fek veranêda labelê semedê ziwanê xo, semedê şarê xo, cuya xo ra fek verada.

Seba aye dergûşa merdimîye ra heta nika xoverdayîş bi vatişanê înan ê peyênan û deyîranê înan sey na şîîre çar hetê Kurdîstanî lerzneno.

*"Ma ko yê, ma nêşinê.*
*Ma şîîr ê, ma ziwa nêbenê. Ma va yê, ma nêtewîyenê.*
*Ma dejê zayîşî yê, ma bi peynî nêbenê.*
*Ma cu yê, ma nêhelîyenê.*
*Rojhelatî ra heta rojawan, cor ra heta cêr.*
*Dardekerdişî heta nika çi şorişê ma ra berdo.*
*Dardekerdişî ma tersnayî?*
*Gelo ê eşkayê koyanê ma bitewînê?*
*Gelo ê eşkayê ma Pîremegrun de weşanê.*
*Rejîmê cezaya dardekerdişî yê Îranî hertim pîr o.*
*La ma hertim ciwan ê.*
*Ewro cehdeyê Sînêyî yo tewr pîl bi Ferzad Kemanger.*
*No serê sibayî ra dima baxçeyê Mahabadî yo tewr pîl bi Şîrîn Elemhulî."*





Dildarê Amedê

# Rojeva germ

Ji xwe rojeva vî welatî gelekî tevlihev û serê mirovan gêj dike îca bi ser de jî rojeva şerê Îran û Îsraîlê lê zêde bû.

Di vê kelekela germê de û di bin banê xurîna fûzeyên Îsraîl û Îranê de rojeva me serobino bûye. Ewqas rojevên germ li vî welatî hene lê medyaya dewletê hemû bernameyên xwe ji şerê Îsraîl û Îranê re veqetandiye. Ez bawer nakim ku xwediyê wî şerî ango Îsraî û Îranê bi xwe jî ewqas li ser vî şerî radiwestin.

Bi her halî em hinekî çavên xwe ji vî şerî bigirin û li rojeva xwe binerin. Heyra em ê çawa çavên xwe li vî şerî bigirin û bandora yekemin a vî şerî ji berîka me derdikeve. Erê bi hinceta vî şerî di nava 24 seatan de buhayê benzîn û mazotê ji derdora 46 lîreyan bû zêdeyî 50 lîreyî.

Îca piştî wê bi rojekê wekî mizgînî dibêjin buhayê benzîn û mazotê derdora 1 lîrayî ji wî buhayê nû kêm dikin. Bi vê yekê rojeva bihabûna sotemeniyê hate guhertin û kêmkirina yek tlyî ji buhayê wê zêdekirina berî çend rojan bû rojev. Yanî rojev bû kêmkirina buhayê sotemeniyê.

Ji aliyekî din ve navê Diyarbakir Sporê kirin Kobanê Spor. Heyra ev çi heskirina ji nişka ve ya Kobanê ye. Bi salane ku stran û muzîka kurdî tên dizîn û wan dikin malê xwe. Wiha xuyaye ku niyet dîsa dizî ye. Diziya navê Kobanê yê ku ne tenê ji bo Kurdan ji bo hemû cîhanê bûye sembola berxwedanê. Niyet ne tenê diziya wî navê ku bûye sembola berxwedanê lê niyet ew e ku bandorê li alîgirên Amedsporê bikin û wan jî bidizin aliye xwe.

Bi vê yekê dibe ku bi vî navî bandorê li xelkê bajêr bike ku wekî Amed Sporê ji tîma Diyarbakir Sporê jî hez bikin.

Niha tevî ku hewldanên pêvajo û çareseriyeke nû li vî welatî hene, lê mixabin tevî hemû gavên wêrek ên aliye Kurd ji alî hikûmetê ve tu gaveke ku dilê mirov rihet bike nehatiye avêtin.

Hinek hêvî hebûn ku bi sererastkirinên qanûnî hin gav bên avêtin û çavên her kesî li azadiya dîlên azadiyê bû lê ew pakêta wan jî vala derket û hêviyên xelkê di qirka wan de zuha kir.

Îsraîlê bi destpêkirina şerê li dijî Îranê ne tenê rojeva vî welatî lê ya Sûriyeyê jî guherand. Xelkên wî welatî yên ku matmayîna xwe ya ji helwesta hêzên cîhanê ya bicihkirina vê desthilata radîkal dijîn, kul û derdên xwe jibîr kirin û rojeva wan jî bû şerê Îran û Îsraîlê.

Di nava vê xirecirê de dîsa ew hêzên tarî û radîkalên terorîst rûyê xwe yê rastî nîşanî gelê Sûriyeyê dan û li Şamê êrişî kilîseyekê kirin û tê de gelek kes kuştin.

Îca piştî wê bûyerê hikûmeta demkî ya Sûriyeyê wê êrişê şermezar dike û dibe ew êrîş nayê qebûlkirin. Îca qaşo ji bo vê mijarê lêkolîn bike hin berpirsên deshilatê hatine pêwirdakirin. Ya ji wê xerabtir jî ew e ku kesên hatine pêwirdakirin bi xwe xwediyê heman hişmendiyê ne. Dîmenekî wî berpirsê payebilind heye ku wî bi xwe berê di nava Nusrayê de peykerê Dayika Meryem li kilîseyekê dişkîne.

Ji xwe ji berê de dibêjin dema ku diz ji malê be girtina wî gelekî zehmet dibe.



# Tiştanok

Gelî hêjayan; mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê Kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

1-"Tiştek xweşik heye
Xwedê ew daye,
Zana û roniye
Heft derî lê ye"
Ew çi ye?

2- "Ne dest e, lê wek hev e
Ne şe ye, wek melêv e
Pehn dibe bi erdê ve"
De bêje ew çi ye?



**Bersivên me ev in:**

*1-* serê mirovan *2-* Lingê mirovan

# Tev jê çêdibin

**Miradê Dêrikî**

Mirovekî gundî û yekî bajarî hevalê hev yê leşkeriyê ne. Piştî ku leşkeriya wan diqede rojekê yê bajarî dibêje ez ê herim gundê hevalê xwe yê leşkeriyê. Diçe gund şevekê li mala hevalê xwe dimîne serê sibê hevalê wî yê gundî jê re tasek şîr tîne û dibêje; ji xwe mast û penêr û lorik her tişt ji şîr çêdibe, ku te şîr vexwar wekî te ew tev xwaribin.

Hevalê wî aciz dibe û berê xwe dide mala xwe.


Piştî demekê yê gundî diçe bajêr û li deriyê hevalê xwe dide. Hevalê wî derî vedike dibîne ku kesê tê hevalê wî yê gundî ye.

Hevalê bajarî jê dipirse û dibêje xêre hevalo vê sibeha zû tu hatiyî bajêr. Yê gundî dibêje wele min got hemî hatime bajêr, ez hevalê xwe û zarokê wî jî bibînim.

Hevalê bajarî meseleya şîr jibîr nekiriye û ji hevalê xwe yê gundî re wiha dibêje; ji xwe zarok tev ji min çêbûne, gava tu min bibînî wekî ku te tev dîtibin. Vaye te ez dîtim êdî hewce nake tu zarokan bibîbînî.



# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

**3-** Navçeyeke Amedê **5-** Cînavkeke yekjimar **7-** Kenar, berqef **8-** Dema ku destê mirov dişewite mirov dengekî wiha derdixe **9-** Perîşan, feqîr **13-** stranên razandina zarokên dergûşê **14-** Bersiva erênî **16-** Bajarekî bakurê Kurdistanê **19-** Safî, şefaf, paqij **20-** Agir **21-** Endamekî laşê mirov **22-** Sewaleke pir mezin **25-** Noteyeke muzîkê **26-** Kesên ji Amedê **28-** Desthilat, hikûmet

## JI JOR BER BI JÊR VE

**1-** Dostanî, hevrêtî
**2-** Biçe
**3-** Reşahiya mirov a li ber tav û ronahiyê çêdibe
**4-** Rok, tav
**6-** Bajarekî rojavayê Kurdistanê
**10-** Hiş, aqil
**11-** Cihê ku ava lehiyê tê de diherike
**12-** Ji ta qalindtir ji werîs ziravtir e
**15-** Danekî rojê
**17-** Ne kedîkirî
**18-** Xisar
**20-** Serbest
**23-** Şînkaya ku zebeş û petêx pêve çêdibin
**24-** kurtaya Fona pereyan ya navnetewî
**27-** Rojeke hefteyê

## Bersiva hefteya borî






Hogir Berbir

# Şibandina jiyanên wekhev

Çîroka jiyana Nelson Mandela û Rêber Abdullah Ocalan, ne tenê di fîlmên sînemayê, an pirtûkên dîrokê de cih digire, di dilê her yek mirovî de cih girtiye û bi têkoşîna azadiyê re deng vedide û diqîre



Fîlmê "Meşa Dûvdirêj ya Ber bi Azadiyê"; wek neynikek perdeya sînemayê ya portreyî, çîroka destanî û efsanewî ya parêzvanê azadiyê ku ji axa bêber a Afrîkaya Başûr derket û qedera neteweyekê guherand, ya Nelson Mandela nîşan dide. Ev fîlmê biyografîk, ne tenê jiyana mirovekî, di heman demê de têkoşîna rizgariya gel, lêgerîna dadî û berxwedana bêhempa ya azadiya mirovî bi awayekî resen vedibêje. Rêwîtiya Mandela, ji zarokatiya wî ya li bajarokekî gundewarî ku dest pê dike û bi hilbijartineke demokratîk heta dibe yekem Serokê Demokrasiya Afrîkaya Başûr; ne tenê kronolojiyeke dîrokî derdixe pêş, manîfestoyeke gerdûnî ya ji bo rûmeta mirovî, xîret, azadî û lihevhatinê derdixe pêş.

**Zarokatî û salên destpêkê**

Di sala 1918'an de, Rolihlahla Mandela li gundê Mvezo yê li herêma Eastern Cape ya Afrîkaya Başûr, wek endamekî ji eşîra Xhosa û nijada Thembû hat dinê. Têgeha navê "Rolihlahla" di zimanê Xhosa de tê wateya "şax kişandinê" an jî "pirsgirêk derxistinê"; dibe ku ev nav nîşana qedera wî ya ku dê statukoya neteweya ku bihejîne û biafirîne. Navê "Nelson" ku mamosteyekî wî lê kiribû, bû sembola nasîna ku bi cîhana Rojava û jiyana wî bi perdeya modern re bê teşekirin. Zarokatiya wî di nav xwezaya bajarokê wek gundewarî bû de derbas bû. Dema li serê çiyayan şivantî dikir, li çîrokên ji devê mezinên gund guhdarî dikir û têgihiştina ku yekem car xwe li gor edaleta civakî bide rûniştandin.

Ciwaniya Mandela di bin siya pergala Apartheidê de derbas bû. Cudaxwaziya nijadî ya pergalê, bi her awayî Reşik dikir bindest û di her qadê de rûmeta wan binpê dikir. Mandela, ku çawa li Zanîngeha Fort Hare dest bi xwendina hiqûqê kir, li wir tovên yekem ên hişmendiya siyasî bi xwe re da rûniştandin. Helwesta wî ya li dijî polîtîkayên otorîter ên rêveberiya zanîngehê, nîşan da ku di temenekî ciwan de xwedî ruhekî têkoşer be. Dema ku çû Johannesburgê û di buroyeke hiqûqê de xebitî, bi rûyekî bêrehm polîtîkayên nijadperest ên li Afrîkaya Başûr dihat birêvebirin ji nêz ve nas kir. Ev bû destpêka veguherîna wî ku bibe parêzerek û têkoşerekî azadîparêz.

**Salên têkoşînê**

Mandela bi tevlêbûna Kongreya Neteweyî ya Afrîkî (ANC), gavên xwe yên siyasî avêt. ANC tevgereke ku mafên piraniya Reşikan diparast; Mandela jî di demeke kurt de di nav ciwanan de bû serokekî qeşeng û pêşengtî kir. Bi vê raman û hişmendiyê, vîna xwe ne tenê ji bo civaka Reşikan, ji bo hemû Afrîkaya Başûrî xist xizmeta gel û bû xwedî ramanekî mafên wekhevî ku biparastin bide pêş. Bi vê îdealê derket rê, lê rastî astengiyên "mûşta hesinî" ya pergala Apartheidê hat. Di sala 1948an de, dema Partiya Neteweyî bû desthilatdar, pergala Apartheidê bû polîtîkayeke fermî ya dewletê û zordestiya li ser Reşikan gelekî zêdetir kir.

Mandela, di vê serdemê de bi xwepêşandanên aştîxwaz û çalakiyên civakî têkoşîna xwe domand. Bi kampanyaya Serhildanê (Defiance Campaign) re tevgera wî ya wekhev, şiyana wî ya serkêşiyê û hêza wî ya mobîlizekirina girseyî xwe da der. Li hember zilm, zor û tundiya pergalê, dest bi xebat û rêbazên aştîxwaz kir lê bi serneket. Di sala 1961ê de, artêşa çekdarî ya ANCê bi navê "Mizraqa Neteweyî" (Umkhonto we Sizwe) damezrand û berê xwe da têkoşîna gerîlatiyê. Êdî tenê ne aktîvîstek bû û di çavên pergalê de bibû "terorîstek!"

**Salên zindanê**

Têkoşîna Mandela ya herî dijwar di sala 1962an de, bi girtina wî xwe da der. Di sala 1964an de, ji "Doza Rivonia" cezayê girtîgehê yê hetahetayî wergirt. Li hember vê li dadgehê bi kûrahî dest bi parastinê kir; bi vê parastinê re hem wekî Serokekî û hem jî wekî fîlozofekî xwe da der û got: "Ji bo îdeala wekhevî û azadiyê, ger hewce be ez amade me ku bimirim!" Vê gotina wî ne tenê li Afrîkaya Başûr, li seranserê cîhanê deng veda.

Zindana Girava Robbenê azadiya Mandela ya fizîkî jê standibû, lê ruhê wî qet teslîm negirtibû. Bîst û heft salan li ocaxên keviran xebitî, di hucreyeke biçûk de hat tecrîtkirin, ji malbat û cîhana derve qut bû. Di wan salan de Mandela bû sembola têkoşîn û berxwedanê. Êdî di nav dîwarên zindanê de ne tenê mirovek bû; ala berxwedana cîhanî ya li dijî pergala Apartheidê bû. Kampanyayên navneteweyî dest pê kiribûn; stran, xwepêşandan û zextên dîplomatîk bi navê Mandela bû bangeke azadiyê ya gerdûnî û bi dirûşma "Nelson Mandela Azad Bike!" belav bûn.

Salên zindanê, bûn serdemeke ku kesayeta xwe hîn bêhtir xûrt bike. Li şûna hêrs û tolhildanê, felsefeya lihevhatin û efûkirina giştî hembêz kir. Nîqaşên bi hevalên xwe yên di zindanê de re meşand, pirtûkên ku bi xwe xwend û nivîsand, bû rêwîtiya wî ya ber bi fikirîneke hundirîn û li xwe pirsînê. Bi vê nêzîkatî û helwesta xwe tenê nebû Serokek, di heman demê de bû rêpîvanek û xeteke gerdûnî biafirîne. Di binê vê bingeh û xeta gerdûnî de vîna xwe ya yekbûyîna Afrîkaya Başûr bi dest xist û dema xwe ya azadiyê nêzîktir kir.

**Ji nû ve zayîna neteweyekê**

Di sala 1990î de, zextên navneteweyî û aloziyên navxweyî yên li Afrîkaya Başûr, rejîma Apartheidê xist rewşeke xerab. Azadkirina Mandela ne tenê serkeftinek bû, di heman demê de ji nû ve zayîna neteweyekê bû. Ew kêliyên dema ku ji zindanê derket, ji bo bi mîlyonan mirovan bû mûcîzeyek. Bi kincên gewr ku nîşana aştî û azadiyê bû, bi destê jina xwe Winnie Mandela girt û bi serbilindî meşiya. Ev meş bû yek ji kêliyên herî bi wate ên dîroka mirovahiyê ku bê afirand û ji nû ve bê nivîsandin.

Mandela piştî azad bû, li şûna tolhildanê aştî û lihevhatin hilbijart. Wekî serokê ANCê, di pêvajoya avakirina sazûmana destûrî ya Afrîkaya Başûr a piştî pergala Apartheidê roleke sereke lîst û cih girt. Di sala 1993an de, bi serokê berê F.W. de Klerk re Xelata Aştiyê ya Nobelê ku nîşana dilsoziya bi diyalog û aştiyê bû, wergirt. Serkeftina herî mezin di sala 1994an de, di hilbijartinên demokratîk ên Afrîkaya Başûr de hat bi dest xist. Mandela, wekî yekem serokê Reşikên li welêt dest bi kar kir. Bi vê tenê serkeftina siyasî bi dest nexist, di heman demê de serkeftina rûmeta mirovihê jî bi dest xist. Mandela di dema serokatiya xwe de hewl da ku vîna "Neteweya Keskûşî"yê bike neynik, da ku cihan li rastî li xwe bimeyzîne. Komîsyona Rastî û Lihevhatinê damezrand da ku kiryarên di serdema pergala Apartheidê de hatibûn kirin, bê darizandin û mehkûm kirin. Bi vê helwestê ne tenê Afrîkaya Başûr, tevahiya cîhanê bi bandor kir. Mandela nîşan da ku bi helwestek wiha dikare hem xwedî hêz û qûdret be û hem jî dilrehm û aram be.


**Şibandin û dengvedana ronahiyekê**

Bi vê fîlmê sînemayê re portreyeke wiha rengîn xwe dide der. Jiyana Mandela bi zayîna neteweyekê re ji nû ve têkel dike û gerdûnîbûna îdealên ji bo dadî, wekhevî û azadiyê bi hêz û qûdreteke bêhempa ronî dibe. Çîroka wî, tenê nabe mîrateya Afrîkaya Başûr, dibe ya tevahiya mirovahiyê. Mandela, ji fîgûrê siyasî wêdetir dibe nîşaneke berbiçav û bêhempabûna ku ruhê mirovan bi hêvî dagire. Dema mirov çîroka Mandela li ser perdeya sînemayê dimêzîne, ji perdeya sînemayê wêdetir wekî destanekê ji nû ve tê jiyîn, di paş perdeya çav de dibore û ev pirs di hişê mirov de derbas dibe; Mirov ji bo van îdealan gerek çi qas bedel bide? Ev 26 sal in Rêberê Gelê Kurd Birêz Abdullah Ocalan ku hîn di zindanê de ye, wê wêneyekî çawa li ber çavên me derbas bike û kengî bibe fîlmekî sînemayê? Gelek pirs û bersiv xwe didin der.

Wêneyê yekbûyîna neteweyî û jiyana ku ji bo rûmeta mirov hatiye veqetandin, di manîfestoya dawîn ya ku ji bo aştiya gelan xwe daye der de, ji mînaka jiyana Mandela ne dûr û kêmtir re. Îro mîrateya Mandela li seranserê cîhanê çawa têkoşîna azadiyê teşwîq dike, fikr û ramanê Rêber Abdullah Ocalan jî wiha teşwîq dike. Rê nîşan dide ku jiyana wan bi her awayê xwe dişibin hev; ev rê dibe delîla vê yekê ku mirovahî di kêliyên herî tarî de jî bikaribe bi fikr û ramanên Rêber Abdullah Ocalan ronahiyê bibîne.


Çîroka jiyana Nelson Mandela û Rêber Abdullah Ocalan, ne tenê di fîlmên sînemayê, an pirtûkên dîrokê de cih digire, di dilê her yek mirovî de cih girtiye û bi têkoşîna azadiyê re deng vedide û diqîre. Ev nîşan dide ku pêvajoya Mandela tê re derbas bûye, pêvajoya Rêber Abdullah Ocalan derbas bibe nêzîktir dike.

Êdî em li benda fîlmekî Sînemayî ne ku kêliyên Rêber Abdullah Ocalan derxîne ser dika perdeya spî û bi kêliyên Mandela ên nemir û efsaneyî re jî bihûne. Di heman demê de têkoşîna Mandela ya neqediyayî û ya Rêber Abdullah Ocalan bi îdealên xweseriya demokratîk belav bike û bike mînakek bêhempa. Ev pêkan e û bi têkoşîna ku bê dayîn re girêdayî ye.



# Zargotina Çîyayê Sîpanê

| Servîsa Çandê




Pirtûka Zargotina Çîyayê Sîpanê ku ji destan, çîrok û meselokan pêk tê li weje û berhemên Kurdî zêde bû. Çîrokbêj Hêcî Mihêmêdê Hêcî Mistêfa mijar vegotiye nivîskar Kenan Subaşi jî tomar kiriye. Ev berhem ji Weşanxaneya Nûbiharê derçûye û zimanê wê kurmancî ye. Berhema ku ji cureyê folklora kurdî ye ji 398 rûpelan pêk tê.

Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Ev beş weke destan, çîrok û meselok ji hev hatine qetandin. Îcar di serê her beşê de piştî agahdariyan an jî pênaseya wê destan, çîrok û meselokê, bêyî destlêwerdanekê, çawa ji devê çîrokbêj Hêcî Mihêmêdê Hêcî Mistêfa derketibin nivîskar Kenan Subaşi jî wiha nivîsiye. Berhemeke folkorîk û kurdî û herikbare ku xwîner tehmekê jê bikin.


## Ferheng
# Kabala

**Berhevoka felsefe û fermanên olî yên Îbranî û qanûnên îlahî yên Cihûyan ên ji derveyî nivîskî yên bi devkî ji nifşekî derbasî nifşên din bûye ye. Dîrokên wan ên rast ne diyar in; Ya herî kevn bi afirandina gerdûnê ve girêdayî ye.**

**Ev xebat ji ber ola gelan ji destpêka Cihûyan ve şîroveyeke veşartî (ezoterîk) ji Zebûr re dike. Tewrat û Kabala di demeke diyarkirî de nehatine nivîsandin. Nivîsîn û derketina wê ya holê bi sedsalan berdewam kiriye û ber bi dawiya Serdema Navîn ve temam bûye.**

**Ew ji du pirtûkan pêk tê, bi navên Sefer Jezirah/Sepher Yetzirah (pirtûka afirandinê) û Sefer Hazahor/Sefer Ha Zohar (pirtûka ronahiyê). Di van pirtûkan de çîrokên felsefî yên ku bi devkî ji nifşekî derbasî nifşên din bûne û bi sedsalan nehatine nivîsîn cihê xwe digirin.**

**Kabalah şîroveyeke mîstîk a nivîsên Îbranî û pergaleke ramanê ye ku hewl dide ku razên gerdûnê fam bike. Bi taybetî hebûnê bi 10 awayên diyardeya (sefirot) Xwedê rave dike. Ew hem li ser kozmolojiyê (pêkhateya gerdûnê) hem jî li ser antropolojiyê (ruhê mirov) analîzên metafîzîkî yên kûr pêşkêş dike.**



**Bi kevneşopî, mêrên cihû yên ji 40 salî mezintir ku hin perwerdehiya olî derbas kiribûn, ji bo bidestxistina vê zanînê mafdar dihatin hesibandin. Lêbelê, ev sînor bi demê re hat nermkirin.**

**Kabalah ne tenê sîstemeke teorîk e; Her wiha balê dikişîne ser ezmûna mîstîk û veguherîna hundurîn. Kabalîst bi teknîkên wekî medîtasyon, qîrîna navên îlahî û balkişandina li ser sembolan hewl didin ku bigihîjin rastiya xwedayî. Ji van kiryaran re "Kabala Pratîk" tê gotin.**

**Wateya Kabalah ji bo Cihûyên niha li gorî mezinbûna olî, mezheb, erdnîgarî û meyla giyanî ya mirovan pir diguhere. Her çend Kabalah di dîrokê de wekî herêmeke nepenî û elîtîst a kevneşopiya olî ya Cihû hate dîtin jî, îro ew zindî tê hiştin û bi awayên pir cûda tê şîrovekirin.**

xwebûn

30 Hezîran - 6 Tîrmeh 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 289

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazışleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Analîza Destana Binevşa Narîn û Cembelî Mîrê Hekarî

## Ev lêkolîn dê ne tenê destanê analîz bike, her wiha girîngiya wêjeya devkî ya Kurdî di çarçoveya wêjeya cîhanî de jî ronî bike. Bi vî awayî, em ê têkiliya di navbera çanda Kurdî û têgînên gerdûnî yên trajediyê de vekolin



Cahîd Kirkazak

Ev gotar, destana Binevşa Narîn û Cembelî Mîrê Hekarî ya wêjeya devkî ya Kurdî li gor prensîbên trajediya modern a Arthur Miller, ku di gotara wî ya "Tragedy and the Common Man" (1949) de hatine diyarkirin, analîz dike. Miller dibêje ku trajedî ne tenê ji bo qehremanên bilind, lê ji bo mirovên asayî jî derbasdar e û ev nêrîn ji bo destanên Kurdî amûreke girîng e. Bi rêbaza analîza wêjeyî ya berawirdî, destan bi pîvanên Miller (qehremanê asayî, têkoşîna li dijî civakê, hestên gerdûnî, hamartia, rûmet) tê nirxandin. Binevş û Cembelî, bi berxwedana xwe li dijî normên eşîrî, wekî qehremanên asayî derdikevin pêş, û çîrok hestên tirs û rehmetê çêdike. Her çend dawiya çîrokê bi zewacê biqede, têkoşîna wan hêmanên trajîkî nîşan dide. Cudahiyên çandî, wekî şêwaza dengbêjî û fokusa kolektîf, destanê ji trajediyên Miller cuda dikin. Lêkolîn girîngiya wêjeya devkî ya Kurdî di çarçoveya cîhanî de ronî dike û têkiliya di navbera çanda Kurdî û têgînên trajediyê de destnîşan dike.

**Peyvên sereke:** Trajedî, Arthur Miller, Binevşa Narîn, wêjeya devkî, çanda Kurdî, qehremanê asayî, têkoşîna civakî, dengbêjî.

Trajedî yek ji wan formên wêjeyî yên herî kevnar e ku di dîroka mirovahiyê de, ji çandên Yewnanî yên kevn heta wêjeyên nûjen, bi şêwazên cihêreng xuya kiriye. Di çarçoveya wêjeya Kurdî de, destanên devkî wekî Binevşa Narîn û Cembelî Mîrê Hekarî bi hêmanên trajîk ên wekî evîna bêdawî, mirin û têkoşîna li dijî normên civakî têne nasîn. Ev gotar armanc dike ku vê destanê bi prensîbên trajediya modern ên Arthur Miller, ku di gotara wî ya navdar "Tragedy and the Common Man" (1949) de hatine diyarkirin, binirxîne. Miller di vê gotarê de îdia dike ku trajedî ne tenê ji bo qehremanên bilind ên wekî padîşah û mîr tê nivîsandin, lê ji bo mirovên asayî jî derbasdar e, û ev têgihiştin ji bo analîzkirina destanên Kurdî amûreke bingehîn pêşkêş dike.

Di vê lêkolînê de, em ê bi rêbaza analîza wêjeyî ya berawirdî destana Binevşa Narîn bi çarçoveya teorîk a Miller re bidin ber hev. Pirsên sereke yên ku em ê bersivê bidin ev in:

➾ Gelo destana Binevşa Narîn û Cembelî Mîrê Hekarî li gor pîvanên Arthur Miller dikare wekî trajediyeke modern were dîtin?

➡ Çawa taybetmendiyên çandî yên di wêjeya devkî ya Kurdî de bandorê li vê forma trajediyê dikin?

✓ Kîjan hêmanên gerdûnî yên trajediyê di vê destanê de derdikevin pêş û çawa ew bi prensîbên Miller re têkildar dibin?

Ev lêkolîn dê ne tenê destanê analîz bike, her wiha girîngiya wêjeya devkî ya Kurdî di çarçoveya wêjeya cîhanî de jî ronî bike. Bi vî awayî, em ê têkiliya di navbera çanda Kurdî û têgînên gerdûnî yên trajediyê de vekolin.

**Kurteya Destana Binevşa Narîn û Cembelî Mîrê Hekarî**

Destana Binevşa Narîn û Cembelî Mîrê Hekarî yek ji wan destanên herî navdar ên wêjeya devkî ya Kurdî ye ku li herêma Hekarî, bi taybetî di nav çîrokên dengbêjan de, hatiye vegotin. Çîrok li ser evîna trajîk a di navbera Binevşa Narîn, keçeke ji malbata Fariz Beg, û Cembelî, kurê mîrê Hekarî, disekine. Binevşa Narîn ji aliyê Derwêş Axa ve tê xwestin, lê malbata wê vê daxwazê red dike. Derwêş Axa, bi hêrs û tolhildanê, êrişî malbata Binevşê dike, bav û birayên wê dikuje, û wê bi zorê dike jina xwe. Lê dilê Binevşê bi Cembelî ve girêdayî ye û Cembelî jî evîna xwe ji bîr nake. Ji bo ku Binevşê rizgar bike, Cembelî xwe wekî şivanekî vedişêre û bi wê re direve. Piştî şopandineke dijwar û metirsîdar, Derwêş Axa dev ji Binevşê berdide û wê helal dike. Çîrok bi zewaca Binevş û Cembelî bi dawî dibe (Celîl & Celîl, 1985).



Ev destan ne tenê çîrokeke evînê ye, her wiha têkoşîneke civakî û şexsî ye ku di nav çarçoveya normên eşîrî de derdikeve pêş. Di varyantên cihê de, hûrgilî dikarin biguherin, lê mijara bingehîn a evîn û berxwedanê her tim domdar dimîne.

**Çarçoveya teorîk: Prensîbên trajediya modern a Arthur Miller**

Arthur Miller di gotara xwe ya "Tragedy and the Common Man" de trajediyê ji nû ve pênase dike û wê ji çarçoveya klasîk a Yewnanî derdixe, ku tenê qehremanên bilind ên wekî şah û mîran vedihewîne. Li gor Miller, trajediya modern li ser bingeha mirovên asayî û têkoşîna wan a li dijî hêzên civakî ava dibe. Prensîbên wî yên sereke ev in:

*1. **Qehremanê asayî:*** Trajedî ne tenê ji bo kesên bi statûya bilind e; qehreman dikare mirovekî asayî be ku têkoşîna wî/wê xwedî wateyekê ye. Miller dibêje ku girîngî ne di statûya qehreman de, lê di cesaret û îradeya wî/wê de ye (Miller, 1949).

*2. **Têkoşîna li dijî civakê:*** Nakokiya sereke di navbera daxwazên takekesî û zextên avahiyên civakî de çêdibe. Ev nakokî qehreman ber bi felaketê ve dibe.

*3. **Hestên mirovî yên gerdûnî:*** Trajedî divê di temaşevan an guhdarvanan de hestên wekî tirs (ji bo metirsiya qehreman) û rehmet (ji bo êşa wî/wê) çêbike, da ku ew li ser rewşa mirovahiyê bifikirin.

*4. **Hamartia ya modern:*** Kêmasiya trajîk ne tenê xeletiyeke exlaqî ye, lê dibe ku ji ber îdealên qehreman an redkirina wî ya lihevhatina bi normên civakî re be.

*5. **Hêza rûmetê:*** Qehreman, tevî têkçûnê jî, bi berxwedana xwe li dijî neheqiyê rûmeta mirovî nîşan dide û wateyekê di têkçûna xwe de diafirîne.

Ev prensîb dê di analîza destana Binevşa Narîn de wekî amûrên bingehîn werin bikaranîn, da ku em têbigihîjin ka ev çîroka devkî çawa dikare di çarçoveya trajediya modern de were dîtin.

**Metodolojî**

Ev lêkolîn rêbaza analîza wêjeyî ya berawirdî bikar tîne, ku destana Binevşa Narîn û Cembelî Mîrê Hekarî bi prensîbên trajediya modern a Arthur Miller re berawird dike. Her wiha naveroka vê çîroka gelerî bi rêbaza Content Analysesê li gorî prensîbên trajediya modern a Arthur Millerê hatiye analîzkirin. Agahiyên têkildarî destanê ji çavkaniyên folklorîk ên wekî berhevokên Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl (1985) hatine wergirtin, ku ev berhevok yek ji çavkaniyên herî girîng ên destanên Kurdî ne. Analîz bi giranî li ser varyanta Hekarî disekine, lê varyantên Şemzînan û Colemêrgê jî ji bo têgihiştina cudahiyên çandî û herêmî têne hesibandin.

Ji bo piştgiriya teorîk, çavkaniyên duyem ên wekî lêkolînên Christine Allison (2001) li ser kevneşopiya devkî ya Kurdî û xebatên Martin van Bruinessen (1992) li ser avahiyên civakî yên Kurdistanê hatine bikaranîn. Her wiha, gotara Miller "Tragedy and the Common Man" wekî bingeha teorîk a vê analîzê hatiye pejirandin. Rêbaza berawirdî dê bi awayekî sîstematîk were sepandin, ku hêmanên destanê yek bi yek bi pîvanên Miller re bên berhevkirin.

**Analîza Destana Binevşa Narîn li gor Prensîbên Miller**

**1. Qehremanê asayî**

Li gorî Miller, qehremanê trajîk ne hewce ye ku kesekî bi statûya bilind be; mirovên asayî jî dikarin bibin qehremanên trajediyê, heke têkoşîna wan watedar be. Di destana Binevşa Narîn de, Binevşa Narîn û Cembelî, her çend ji malbatên navdar ên wekî Fariz Beg û mîrê Hekarî bin jî, di çarçoveya civaka eşîrî de wekî qehremanên "asayî" têne dîtin. Ew ne şahên efsanewî an kesên xwedî desthilatdariyeke mutleq in, lê mirovên ku bi evîna xwe û berxwedana xwe li dijî normên civakî têdikoşin in. Ev taybetmendî wan bi qehremanên Miller, mîna Willy Loman ê di Death of a Salesman de, ku mirovekî asayî ye û li dijî xeyalên civaka kapîtalîst têdikoşe, dişibîne. Di vê wateyê de, Binevş û Cembelî nûnertiya mirovên asayî dikin ku bi îradeya xwe derdikevin pêş.

**2. Têkoşîna li dijî avahiya civakî**

Di destanê de, nakokiya sereke di navbera daxwazên takekesî yên Binevş û Cembelî û normên civaka eşîrî de derdikeve holê. Derwêş Axa, wekî sembola desthilatdariya eşîrî, Binevşê bi zorê dibe ku bibe jina wî û bi vî awayî daxwazên wê yên şexsî binpê dike. Lê Binevş û Cembelî bi biryara revê li dijî vê avahiya civakî berxwedaneke eşkere nîşan didin. Ev têkoşîn bi prensîba Miller re, ku trajediyê wekî nakokiya di navbera takekes û civakê de dibîne, li hev dike (Miller, 1949).

Lêbelê, di çarçoveya Kurdî de, avahiya civakî ji ya di berhemên Miller de cuda ye. Di civaka eşîrî de, normên namûsê, hiyerarşiya malbatî û desthilatdariya mêran li ser jinan roleke sereke dilîze (van Bruinessen, 1992). Ev yek ji avahiyên kapîtalîst an modern ên di trajediyên Miller de cihê ye, lê têgihiştina bingehîn a têkoşîna takekes-civak di her du çarçoveyan de heman dimîne. Ji ber vê yekê, destana Binevşa Narîn di vê xalê de bi têgînên Miller re lihevhatî ye.

**3. Hestên mirovî yên gerdûnî**

Destan bi bûyerên xwe yên trajîk, wekî kuştina bav û birayên Binevşê ji aliyê Derwêş Axa ve û êşa wê ya ji ber zewaca bi zorê, hestên tirs û rehmetê di guhdarvanan de çêdike. Dengbêj, bi şêwaza xwe ya helbestî û melodîk, vê êşê bi awayekî kûr û bi bandor vedibêjin, ku ev yek bandora hestyarî ya çîrokê xurtir dike (Kreyenbroek, 1995).

Her wiha, rev û têkoşîna Binevş û Cembelî ji bo evîna xwe hêviyeke nazik dide guhdarvanan, lê metirsiya şopandina Derwêş Axa tirsê zêde dike. Ev hestên dualî – hêvî û tirs – bi armanca Miller re, ku dixwaze temaşevan li ser rewşa mirovahiyê bifikire, li hev dikin. Di vê çarçoveyê de, destan ne tenê çîrokeke herêmî ye, her wiha xwedî hêmanên gerdûnî ye ku dikare bi her guhdarvanî re têkildar bibe.

**4. Hamartia ya modern**

Li gorî Miller, hamartia ya modern ne xeletiyeke exlaqî ya kevneşopî ye, lê dibe ku encama îdealên qehreman an redkirina wî ya lihevhatina bi civakê re be. Di destanê de, hamartia ya Binevşê redkirina wê ya zewaca bi Derwêş Axa re û biryara wê ya revê ye. Ev îdealên wê yên ji bo evîn û azadiyê wê ber bi rewşeke metirsîdar ve dibe, ji ber ku Derwêş dikeve pey wan. Ji aliyê Cembelî ve, hamartia wî xwebaweriya wî ya ku ew dikare Binevşê rizgar bike ye, ku ev yek wî dixe nav xeteriyê. Ev kêmasiyên modern bi pênaseya Miller re, ku hamartia wekî encama îdealên qehreman dibîne, li hev dikin (Miller, 1949).

**5. Hêza rûmetê**

Binevş bi redkirina Derwêş Axa û têkoşîna xwe ya ji bo evîna xwe rûmeta xwe diparêze, û Cembelî jî, bi revandina Binevşê û amadebûna şerê li dijî Derwêş, cesaret û rûmeta xwe nîşan dide. Tevî ku çîrok bi dawiyeke xweş biqede û Derwêş paşve gav bavêje, berxwedana wan, wan wekî qehremanên trajîk bilind dike. Ev yek bi prensîba Miller re, ku rûmeta mirovî di berxwedanê de dibîne, têkildar e. Di çanda Kurdî de, rûmet û namûs nirxên bingehîn in, û têkoşîna Binevşê ev nirx bi awayekî eşkere nîşan dide (van Bruinessen, 1992).

**Cudahiyên çandî di navbera trajediya Kurdî û trajediya modern a Miller**

Her çend destana Binevşa Narîn bi prensîbên Miller re di gelek xalan de li hev bike jî, cudahiyên çandî yên di navbera wêjeya devkî ya Kurdî û trajediyên modern ên Rojavayî de hene:

***1. Çarçoveya civakî:*** Têkoşîna di destanê de li dijî normên eşîrî û hiyerarşiya namûsê ye, ne li dijî avahiyên kapîtalîst an modern ên di berhemên Miller de. Di civaka Kurdî de, têkiliyên malbatî û eşîrî bingeha avahiya civakî ava dikin, ku ev yek ji çarçoveya modern a Miller cuda ye (van Bruinessen, 1992).

***2. Şêwaza vegotinê:*** Destan bi forma dengbêjiyê ya devkî û helbestî tê vegotin, ku ji şanoya nivîskî ya Miller cuda ye. Dengbêjî ne tenê çîrokê vedibêje, her wiha nasnameya çandî û dîrokî ya Kurdî diparêze, û ev yek wê ji formên wêjeyî yên nivîskî cihê dike (Kreyenbroek, 1995).

***3. Fokusa kolektîf:*** Di destanê de, felaket ne tenê şexsî ye; kuştina malbata Binevşê (bav û bira) jî tê de ye, ku ev yek ji trajediyên takekesî yên Miller cuda ye. Di çanda Kurdî de, rûmet û felaket bi gelemperî kolektîf in û bandorê li malbat an eşîrê dikin (Allison, 2001).

**Encam:**

Destana Binevşa Narîn û Cembelî Mîrê Hekarî bi hêmanên xwe yên trajîk ên bi hêz li gorî prensîbên Arthur Miller wekî rehên trajediyeke modern di nav xwe de dihewîne. Binevş û Cembelî wekî qehremanên asayî, bi têkoşîna xwe ya li dijî normên eşîrî, rûmeta mirovî nîşan didin. Nakokiya wan bi civakê re hestên tirs û rehmetê di guhdarvanan de çêdike û hamartia wan rê li ber metirsiyeke trajîk vedike. Tevî ku ev çîrok di nav çîrokên geleriyê yên kurdî cudatir bi zewaca wan ango bi awayakî baş bi dawî dibe jî, metirsiya di rêwîtiya wan de hêmanên trajediya modern tîne bîra mirov ango çîrok bi awayekî trajîk neqede jî di nav xwe de bûyerên trajîk dihewîne. Ev jî rewşa balkêş a vê çîrokê ya di nav çîrokên kurdî yên gelêrî ye ku trajedî di nav plotên çîrokê de derbas dibe lê dawî tehmeke çirvanokê dide.

Cudahiyên çandî, wekî şêwaza dengbêjî û fokusa kolektîf, destanê ji trajediyên Miller cuda dikin, lê dîsa jî ew wekî trajediyeke modern a bi çarçoveya Kurdî tê dîtin. Ev analîz girîngiya hêmanên trajîk ên gerdûnî di wêjeyên cuda de ronî dike û nîşan dide ku destana Binevşa Narîn ne tenê çîrokeke evînê, lê têkoşîneke mirovî ya kûr e.



***Çavkanî:***

✓ Allison, C. (2001). The Yezidi Oral Tradition in Iraqi Kurdistan. Curzon Press.

✓ Celîl, C., & Celîl, O. (1985). Zargotina Kurda: Çîrok û Destan. Weşanxaneya Roja Nû.

✓ Kreyenbroek, P. G. (1995). Yezidism: Its Background, Observances and Textual Tradition. Edwin Mellen Press.

✓ Miller, A. (1949). "Tragedy and the Common Man". The New York Times.

✓ Van Bruinessen, M. (1992). Agha, Shaikh and State: The Social and Political Structures of Kurdistan. Zed Books.